

welat

Sal:2 Hejmar:99 9-15 Rêbendan 1994 10.000TL (KDVD)

Rojnameya Hefteyi

Rêxistina ku
bingeha Komara
Mehabadê danî:
Komeleyî
Jiyanewey Kurd

Rûpel 12



Di hilbijartinê Adarê de li Kurdistanê **Hedefa dewletê DEP e!**

Dewletê berê êrîş û cerdên xwe bêsekan daye ser DEP'ê. Kuştin, girtin, binçavkirin û zirardayîna li ser wan didomê. Ji rayedarêne dewletê, ji yê serî heya bi yê binî ve dadixuyînin ku wê têkilî bi hilbijartinê bikin. Ji niha ve dixuye ku hilbijartîn di rewseke azad de çenabe.

Partiya Demokrasiyê li gel pêkutî, kirinêne dewletê û rîlibergirtinê li pêsiya xwe, çalakiyên xwe didomîne. Li dû lidarxistina îtîfaqan e ji bo hilbijartinê bi partiyêne cepgir û pêşverû re. Di gel vê yekê helwestêne DEP'ê yên der barê hilbijartînan de tê meraqkirin.

Rûpel 8



Komara Tirkîyê li Kurdistanê niha ji bo operasyoneke dorfirehtir û mezintir leşkeran tevî çekên giran verê Kurdistanê dike da ku beriya hilbijartînê "piş li PKK'ê" bişkîne û di hilbijartînan de bi ser keve.

DI VË HEJMARÊ DE

Serhildan û şanoya
Kurdî
Pismam

Rûpel 11

Meşa Azadî
bi serketinî kuta bû
Selîm Biçûk

Rûpel 4

Çemê Efrînê û
Bêrîvan
Fener Rojbiyanî

Rûpel 6

Serhildana
gundiyên şoreşger
bi ser neket

Rûpel 4

Hemo çû semerê
hat dîsa kerê berê
Jêhat Gimgim

Rûpel 7

Parîs û Kurdistan
Abdurrahman Durre

Rûpel 13

Meşa YRWK'ê – 2
Dilbixwîn

Rûpel 3

'Armanca me ya
dawî Kurdistanêne
serbixwe ye'

Rûpel 5



PÊKENÎN
Û PÊKENOKÊN
ME!

Rûpel 10



OTONOMÎ DI ZIKÊ
SERXWEBÛNÊ DE
XWÎNROJANDIN E!

Rûpel 14

Devê mawzerê

Devê mawzera xwe germ bike
Bila berik herin dilê reş û tarî
Weke taviya bîharê
Bila bilerize lingên sitemkaran
Kurên Cengîz û Holago ne ew
Talan kir wan Amed û Bexda
Tênegihiştin qet çi ye mirovahî
Vedixwin xwînê weke caran.
Xakparêz û sosyalistên Kurd
Bersiva rast didin mêtjûyê
Da bikişînin lingên xwe
Kurên Yavuz û Tîmor
Ji kelan, birc û zinaran
Neviyêñ Keyxsar in ew...
Şagirtên Mazlûm û Xeyrî ne,
Gîyanê distînin ji Heqî û Pîr, Gîvara.
Dixwazin nû bikin
Xeml û xêza Rojhilat
Li gel Newroz û sersal û biharan.

Hüseyîn Savus

Dilê xemgîn

Rabe binêr dilê xemgîn
Bizan ez û tu bi hev re
Derketin welatê şîrîn
Dîl man ez û tu bi hev re

Me girê dan li diyaran
Bi bend û zincîrên kevnar
Dîl hiştin li nav neyaran
Bêemir û ferman û bîryar.

Bila qenc bizanin dilo
Bê dil em naçin bihiştê
Ez û tu jî bi hev re lo
Bikin sema, bikin geştê.

Ji bo min û te şîrîn e
Welat û gelên bindestî
Sond dixwim ala rengîne
Xweş e cehennem bi serbestî.

Dilo ez û tu bi hev re
Mane dil û bêsema
Hatin cîhanê bi hev re
Ji bo derd û ji bo xeman

Hevalê şîrhalal dilo
Tê bîra te dilovanî
Ez û tu tim bi hev re lo
Xebatkar bûn bi lawanî

Dilo şîyar be seher,
Binêre tu li cîhanê
Xwînmij wa ne ber û serê
dimêjin ew Kurdistanê

Welatê xelkê wek cinan
Ez û tu tev lê xemgîn in
Ji bo me bû wek zindan
Ez û tu lê ne şîrin in

Sîpan Xizan / Amed

Momekan kiz Esûtêñ

Bo yadij cejniy le dayîk bûniy
“Çiya” y kurrim
Momekan egrîn legel me
ta beyanî
Ewan esrîniy belalûkî
da erêjin zerd û pemeyî
eykene milwankey bûkiy xurbetim...!
Tezbîhiy niwêji xelwetiy şewme
Ta şebeqiy sûr...!
Momekan bixtewerin
Etwênewe emrin...!
Ezim bo kostêkiy tir be ser zindû!
Dêmewe meydânî SîN...!?
- Ewan girryan be min esûtê
- Minîş dîlim be wan...!
Herdû be ahiy perwanewe
Ebînewe bêgiyan...
Rohiy min efrê le tek hewra...!
Heta egate wilat
Bew hîwayey le naw denke baranêka
Bikewête hewsekeman û
Kurekem gemey pê bikat...!
- Hiy momekanîş dîn cestemewe
Her wekû kûrey asingeran
Coşim eden, qalim eden
Ta beyan...
Momekan egrîn bo çarem
be wefan.

M. Emin Pêncwînî

Ji hevalê Nûşer Dîlan re bersivek

Xebatkarên rojmemeya Welat;
Serketina we ya giranbuha bi can û
dil pîroz dikim û wisa bi hêvî me
ku, wê hejmarêñ Welat bigihîjin se
dan, hezaran, sed hezaran...

Hevalê hêja Nûşer Dîlan di hej
mara 94'an de, rexneyek anîbû li
ser pirtûka Gabar Çiyan a bi navê
‘Êşa zirav’. Dixwazim bersiva vî he
valî bidim, der mafê vê mijarê de.

Li gor dîtin û ramana min niv
sandina ku li ser pirtûkê hatibû niv
sandin (Êşa Zirav) rast e. Ji ber ku
peyva “zirav” tiştekî cuda ye, “ze
rav” an jî “zerdav” tiştek cuda ye.
Wisa xuya dike ku hevalê Nûşer
van tevlîhev dike. “Zirav” tê wateya
nestûriyê an neqalindiyê. Lê belê
“zerav”; ji zertavê (an jî zerd+av) tê
û nayê wateya ziraviyê.

Bi kurtasî wekî nivîskarê hêja Ga
bar Çiyan jî nivîsiye di “Êşa zirav”
de ji aliyê wateyê ve tu tevlîhevî tu
ne ye.

Raser Balyoz / Amed

Nîvîsara Welat

Belavkirina Welat

Em vê hefteyê dixwazin li ser awa û rewşa
belavkirina Welat agahiyê bidin xwende
vanen xwe û banga alîkariyê bikin, ji bo
çareserkirina pirsgirêkên me yên di vî warî de. Ji
bo rojnameyekê, belavkirineke baş û bi rîkûpêk
pirr girîng e. Li hemû deverên dînyayê ev kar bi
destê şirketên belavkirinê tê meşandin. Jixwe ne
bi wî awayî be, ne mimkûn e ku weşanek xwe ka
ribe bigihînîne hemû deveran.

Rojnameyêñ ku berdevkiya dewletê dîkin û ji
ber vê yekê bûne holding, ew xwedî şirketên be
lavkirinê ne jî. Zehf caran ev şirket naxwazin roj
name û kovarêñ serbixwe belav bikin. Ev raste
rast nabêjin ku belav nakin, lê bi metodêñ plankiri
mercêñ wisa giran datînin ber weşanen serbixwe
ku nikaribin bipejirînin. Mixabin ev çend meh in ku
ev problem rî li ber belavkirina Welat digire û me

m e c b û r
dihêle ku ne
ma em bi şîr
keta BBD'ê
Welat belav
bikin.

Ji ber vê
yekê, ji vêga
pê ve emê bi
îmkânên xwe
Welat belav
bikin. Lê bi
rastî ev kare
kî pirr zehmet
e. Tevî vê
yekê bi alîka
riya xwendevanen xwe emê karibin ji heqê vê
problema giran jî derkevin.

Xwendevanen me yên ku îmkana wan heye di
vî warî de alîkariyê bi me re bikin, ji kerema xwe
re bila li me bigerin. Mixabin, wisa hetâ ku em bi
şirketeke din re peymana belavkirinê çêbikin, wê
Welat bi dest bê belavkirin. Wisa xuya ye ku bi
pêvajoya du sê mehan wê belavkirina Welat bi vî
awayî bimeşe. Em bawer in ku xwendevanen We
lat wê di vî warî de jî li rojnameya xwe xwedî der
kevin û di belavkirinê de ci jî destê wan tê, wê bi
kin. Yêñ ku ev îmkânên wan nîn in jî, dikarin bibin
abone û aboneyen din ji Welat re bibînin.

Birêz Emîne Ülek

(Diya Ramazan Ülek)

Bi qezaya trafîkê

ji nava me koça xwe bar kir.

Xemgîniya wan ya xwe dibînim.

Bila serê malbata wê sax be.

Aynur Bozkurt

.....NÜÇEYÊN CENGÊ.....

Gelê Kurd di binê zilma cerdevan û tîman de ye

28 Kanûn 1993: Leşkeran avêtin ser gundê Xaçekê ku li ser Pirana (Dicle) Amedê ye, ji bo ku cerdevaniyê bipejirînin 10 kes rehîn girtin.

Li Culemêrgê (Hakkari) bi navê Zekî Yalcin û li Bismila Amedê ji bi navê Sadik Kortak du kes ji aliyê kontrayan ve hatin kuştin. Ji bo merasîma cenazê Kortak sê hezar kes meşyan.

Leşkeran avêtin ser gundê Dokûzdamê ku li ser Şaxa (Çatak) Wanê ye, di mala cerdevanekî de 6 kîlo esrar dîtin.

Heft kesen ku ji Stenbolê diçûne İdirê, li Qaxizmanê ji aliyê dewletê ve hatin girtin. Ta niha ji wan tu agahî nîn e. Kontrayan li Amedê li Taxa Baxlarê di kolana Sento de bi navê Ayhan Doxan, Mehmet Akçamli 2 kes kuştin. ERNK'ê li Amedê leşkerekî pispor (çawus) kuştin.

29 Kanûn 1993: Li Wanê bi Ahmet Acar, li Batmanê Sîrac Cengiz û Abdullah Bayandır, li Amedê Mehmet Dayan, Li Erzeromê Necati Polat ji aliyen kesen nedîyar ve hatin kuştin. Li Amedê xwendiyê "Amed Kûrûymî" Mustafa Sarili birîndar bû.

Hêzên dewletê cerdi ser gundûn Alût û Panikê ku li ser İdirê ne, kîrin û li gundê Alûtê Yusuf Îbîn, Zekî Çaxçax û hin kesen din xistin bin çav. Leşkeran li gundê Panikê mala Faik Kizilay xistin destê xwe û kîrin qereqol.

Li Qosera Mîrdînê bi navê Ali Altındağ kesek bi êrişâ kesen nedîyar ve birîndar bû.

Tîmîn taybetî li Pazarcika Mereşê li gundê Tîkîlerê, di mala gelek gundiyan de qereqol çêkirin. Ew 5 gundiyan ku ji aliyê tîmîn taybetî û kontrayan ve hâtibûn kuştin, li ser ferma ERNK'ê li İdirê esnafan kepeng, şofîeran kontakên erebeyan girtin.

30 Kanûn 1993: Hêzên dewletê êriş birin ser Zozanê Dîrika Mîrdînê Gûrkê, bi tevî pez û dewaran 10 mal şewitandin. Leşkeran li 8 gundûn Melazgira Mûşê 78 mal şewitandin. Polisan li Tûxa (Tatvan) Bilisê 3 şagirt xistin bin çav û birin li gundûn ku xaniyêن wan hatine hilweşandin, gerandin. Bi mebesta ku wan kiriye. Li İdirê ew kesen ku kepengê xwe girtibûn ji aliyê tîmîn taybetî ve pîrsiyarî li wan hate kîrin.

Hêzên dewletê cerdi ser gundê Xidirbiyixê ku li ser Dutaxa (Tûtak) Agiriyê ye kîrin, 15 gundi xistin bin çav. Li Qosera Mîrdînê li gundê Hewtexwehayê cerda hêzên dewletê çebû, ji bo ku cerdevaniyê bipejirînin ew bi kuştinê hatin çavtîrîskîrin. Li Amedê bi navê Şehmus û Mehmet 2 kes xistin bin çav. Li Amedê polisan 2 şagirtên Lîseya Ziya Gökalpê xistin bin çav. Bi navê Musa Cîn kesek li Wêranşarê (Vîranşehr) ji aliyê cerdeven tîmîn ve hate girtin. Ji Musa Cîn heta niha tu agahî nîn e. Polis û jendirmeyan li navenda Cizirê dest bi operasyoneke dorfîreh kir, bi navê Şadî Bahaner, Naif Aco, Nadîr Aco, Hacî Aco, İbra-

■ Serê ku li Kurdistanê didome iro gîhiştiye demajoyeke nû. Rola leşkerê Tîr û ya gerîla li Kurdistanê bi hêsanî tête xuyakîrin. Dewlet her diçê diranê xwe yêni bi xwîn nîşanî gelê Kurd dide. Ji bo hilbijartinê, gundiyan yek bi yek li ser hev kom dike û gişî dixe bin bandora tîm û cerdevan. Dixwaze wan kesen ku ji bo gelê Kurd dixebeitin di zîndanan de bigire û wan bêtésir bîhêle. Li hember van rewşê nerind gerîlayen ARGK'ê bi serfirazî pozberiyen xwe çedîkin û riya serketinê vedikin.

hîm Küçük, İbrahim Evlat, Ahmed Yalnız, Abdurrahman Yalnız, Abdurrahman Kaplan, Mehmet Yaşar, Ali Yaşar, Ahmet Yilmaz, Mehmet Şîrîlî, Cemal Şîrîlî, Mehmet Ali Osmanoğlu, Sami Parlak, Mehmet Parlak û Abdulrahim Nadîr 19 kes xistin bin çav.

Hêzên dewletê li Çiyayê Cûdi, Gabar û Hereqolê operasyonan pêk tînin. Di navbera cerdevan û gerîlayen de şer derket, der barê şer de agahî nîn e.

Li gundê Girdikanê ku li ser Hewêla (Baykan) Sîrtê ye, hêzên dewletê êriş birin ser malekê û bi navê Cevat Tokdemîr kesek kuştin û Mehmet Tokdemîr, Mecburê Tokdemîr, Ayten Tokdemîr, Hacer Tokdemîr, Guler Tokdemîr xistin bin çav. Dewlet kotekeyê li ser cerdevenan Azerî yên gundê Ortaalicanlarê ku li ser İdirê ye dikin, ji ber ku besdarî operasyonan nabin. Li Kerborana (Dargeçit) Mîrdînê polisan êriş bir ser malan û bi navê Süleyman Seyhan, Haci Çelik, Ahmet Kaya, Abdullah û Şükrû û gelek kesen din xistin bin çav.

1 Rebendan 1994: Li Pasûra (Kulp) Amedê, li zozanen Şenê hêzên dewletê operasyoneke dorfîreh pêk anî. Di operasyonê de Mehmet Salih Akdeniz, Behçet Tutuş, Abdo Yamuk, Nusrettin Yerlikaya, Hasan Abar, Mehmet Şerîf Abar, Bahri Şîmşek, Mehmet Şah Atalay, Turan Demîr, Behçet Taş, Celil Aydinoğlu 11 kes xistin bin çav. Ji van kesan heta niha tu agahî nîn e.

Cerdeven û leşkeran avêtin ser gundê Dödekliyê û Aşaxî Artanê ku li ser Aralixa İdirê ne, gundi bi kuştinê çavtîrî kîrin, ji bo ku cerdevaniyê bipejirînin.

Li Melazgira Mûşê ji 5 gundan 22 malbat ji ber zordarya dewletê koç kir. Hêzên dewletê li Hezexa (İdil) Şirnekê operasyonê anîn pê û 100 kes xistin bin çav. Yen ku em navê wan dizanîn ev in: Şerîf Mete, Nusrettin Yildiz, Ali Yildiz, Ekrem Nas, Halil Nas, Abdurrahman Nas, Nazim Aşkin, Ömer Asan, Ali Aksakal, Kazım Babat, Hamdi Bulut, Hasan Esmer, Avnî û Mehmet.

2 Rebendan 1994: Gerîlayen ARGK'ê riya Erxen û Madenê birîn, kontrola nasnameyan kîrin û 8 kes kuştin. Li İdirê ji gerîlayen erebeyeyeke polisan dane ber gulebaranê û polisek kuştin û 2 polis ji birîndar kîrin.

Li Amedê Taxa Seyrantereyê li ser riya Farcînê, erebeyeyeke po-

lîsan ji aliyê endamên ERNK'ê ve hate gulebarankîrin. Gerîlayen ARGK'ê li Midyada Mîrdînê endamekî kontrgerîla kuştin.

Mînibusa ku di hundîrê wê de cerdeven hebûn, li ser riya gundê İncîrlîkê ku li ser Bîrecîka Ruhayê ye, li mayîn qelibî, sercerdeven Salih Demîrbilek birîndar bû. Pişti bûyerê hêzên dewletê li navçeyê dest bi operasyonan kîrin û gelek kes xistin bin çav. Yen ku em navê wan dizanîn ev in: Fuat Sarıkaya, Metin Sarıkaya, Şahîn Kılıç, Besraî Kılıç.

3 Rebendan 1994: Hêzên dewletê li gundê Toroniyê ku li ser Şîrnexê ye, bi navê Emîn Kaya kesekî hildan bin çav û ew bi işkenceyeke hov kuştin.

Gerîlayen ARGK'ê êriş birin ser gundê Dîkbozgazê û Reşînayê ku li ser Diha (Erûh) Sîrtê ne, ji malbatê cerdevenan 15 kes kuştin. Leşkeran avêtin ser gundê Evcîya İdirê, hemû mal serobîni hev kîrin û herdu milê pîrekekê şikandin. Bi navê Newroz Ateşoğlu kesek ji aliyê dewletê ve hate girtin û di bin çav de milê wî hate şikandin, bûyer li İdirê qewimî.

Dewletê li Hezoya Elihê operasyoneke pêk anî û 5 kes xistin bin çav. Li Batmanê ji, ew 14 kesen ku ketibûn bin çav, ji wan 9 kes hatine girtin. Li gundê der û dorêne Gevera Culemêrgê û li navenda Geverê leşkeran 7 kes xistin bin çav. Ji ber êrişen dewletê li Pasûra Amedê 5 gund vala bûn.

Cerdeven gundê Algîzîlê ku li ser İdirê ye, êriş birin ser gundê, gelek mal xesirandin.

4 Rebendan 1994: Gerîlayen ARGK'ê êriş birin ser Qeqrola Engûlê ku di navbera Çepenkür û Hêne de ye, 18 leşker kuştin. Pişti bûyerê leşkeran êriş birin ser otobüsên sivil, 15 rîwî birîndar kîrin. Gerîlayen ARGK'ê erebeyeyeke polisan li ser riya İdirê û Bazîdane ber gulebaranê, polisek kuştin û 2 polis ji birîndar kîrin.

Li Batmanê, li Midyadê, li Silopiyê û li Wêranşarê H. Reşît Kılıç, Abdülkerîm Ergun, Ali Sînan Karga ji aliyê kesen nenas ve hatin kuştin.

Serokê DEP'ê ye Mîrdînê Mehdi Aslan û Qoserê Ata Salman ji aliyê dewletê ve hatin girtin. Hin kesan bombe avêtin Lîseya Xinûsê û xesirandin. Pişti bûyerê di navçeyê de hêzên dewletê operasyonan pê û 30 kes xistin bin çav.

Dilbixwîn

HAWAR

Meşa YRWK'ê - 2

Meşvan hemû di yek nîrînê de bûn: "Meşa me meşek e dîrokî ye. Bi vê meşa xwe, em rewşenbîren Kurd rûpeleke nû vedikin. Ev destêk e, me binyada xebateke bi rûmet danî. Edî em ji dikarin bibêjin, pareke me di şoreşê de heye..."

Hiqûqzan Şerif Wanlı bi dirêji li ser rola meşê râwestiya. Dîroka rîveçûna bizava rewşenbîriya Kurdî bi dorfîrehî anî ziman: "Em parçeyekî gelê Kurd in. Şoreşa li bakurê welat şoreşa me ye, em neçar in wê şoreşê biparêzin û lê xwedî derkevin. Ez careke din dubare dikim û dibêjim; ew kesen ku di bin navê Kurdayetiye de pişta dijmin digirin û êrişan tînin ser vê şoreşê, ew ne Kurd in, ew dijminen Kurdish in, ez dîsa wan xayîn (Kurdên xayîn) nîşan didim... Divê em rewşenbîren Kurd van rastiyen eşkere bikin û bêdudîlî ji şoreş û meşa xwe ya azadiyê re bibin piştgir..."

Nazdara 6 salî çend helbesten şîrîn pêşkêş kir. Bi bejna xwe ya kinik û bi devê tim li ken, temaşevan dilşa kirin.

Dor gihişte

Dr. Rodî. Dr. Rodî. Di m e ş a YRWK'ê de bûyerâ herî balkêş ev bû: Meşvan; bi roj doktor in, propagandîst in, rojnamevan in, alhilgir in (aldar in)... Bi şev ji helbestvan, şanoger, spiker, çî-

rokbêj û tembûrvan in. Hemû ji, pêxwas diçin ser mîkrofonê.

Dr. Rodî ji, bi roj lingên meşvanan derman dikir, bi şev ji, ji wan helbest dixwendin. Weke ku bombebek di salonê de biteqe, helbesten wî ne bûn ji, şewuya (islûba) xwendina wan bala mirov dikişande ser xwe.

Li ser hevalê Mesûd ku çavên xwe ji azadiyê re kîrine xelat –ew ji di nava meşvanan de bû– hozanvan Pêncewînî di bin navê "Çaw" de helbestek xwend. Bi xwendina wê helbeste re dilê me xemgîn bû, çavên me ji şerma çend dilopên ava germ ji kehniya hesreta azadiyê û ji eşâ bindestiyê barandin. Helbesta wî bi zaravayê Soranî bû.

Bi çepikên temaşevan re hozan Zamanî cû ser mîkrofonê, çend pêkenok û strana "Apê Mûsa" ji dilekî hingavtî xwendin û li dawiyê got: "Ne ji bo koletiyekê kor, ne ji, ji bo darêne dagirkeran, em Kurdên azadîxwaz in..."

Êşa di dilê meşvanan de ji peqika lingên wan, ji ja na pişte û ji barîkatêne polîsên Almanan dijwartir bû. Ne eşâ rojekê bû, ne ya mehekê, ne ji ya salekê bû. Meşvanan li ser wê eşâ bi azad gelek helbest, gotar, roman, şano û çîrok nivisandibûn. Pirranî rojên jiyanâ xwe bi nale-nala ji ber wê eşâ derbas kiribûn. Heyecana meşê ji bilî azadiyê tiştek nedianî bîra wan. Li ser yekê Dr. Rodî nimûneyek anî ziman: "Ez ji wan re dibêjim, lingên we birin bûne, werin li mînibusê (erebeyê) siwar bin, dibêjin, "Nal! Lingên me, me negîhinin Brûkselê bila qut bibin..."

Belê, ne bi lingan derman bi birîna di dil de gerek e, heke ew derman bibe çavkaniya eşan dimicîqe.

Saet bû 23.00. Meşvanan betanî ji xwe re kirin doşek, çakêt weke balîfekî xistine bin seriyan xwe, betañîyeke din bû mitêl. -Di wê salona şevê de "nîvînê" –em nav lê bikin nîvîn- raxistin. Nivîskar, hunermend, rojnamevan û rewşenbîren me, her kes ji xwe re li ciheki digeriya ku betaniya xwe raxe.

Kesen weke Zamanî beijindirêj li xwe diheyriyan. Bejna Emekçi kin bû, zû ji xwe re cih peyde kir.

"Şev baş..." Min xatirê xwe ji wan xwest. Ji azadiyê re me destê hev guvaşt û em bi hev re ala xwe hildin. ji Brûkselê ku berê xwe bidin Diyarbekirê. Ne dûr e!

Zana di nav jinên balkêş de

Kovara jinan Marie Claire, ji bo sala 1993'yan 30 heb jin hilbijartin. Ji van jî 10 heb ji ber ku di nav şertên dijwar û jiyana bi xetere de, rûmeta xwe parastine, hatin hilbijartin.

Ji van 10 jina yek jî mebûsa Partiya Demokrasiye Leyla Zana ye. Li gorî kovarê Leyla Zana, ji bo parastina mafêne Kurdan jiyaneke bi xetere de dijî.

Divê listê de ji gelek deveren dinyayê jin, cih digirin.

Yek jî van Îmeja Noğgîç, li Saraybosna di pêşbaziya bedewiyê de yekemîn hatibû hilbijartin. Îmeja Noğgîç, ji ber ku Saraybosna di bin ablukayê de bû, neçûbû Pêşbaziya Bedewiya ya Dinyayê. Di vê listê de kamerasama televizyona CNN'ê Margaret Gipsy Moth jî cih digire. Li Saraybosna, ji çavê xwe bi gulliyekî hatibû birîndarkirin kameraman Moth. Lî wê dev ji wezîfeya xwe berneda.

Kovara Jina Marie Claire, bi sernivisa "Qehremanen Hêviyê - 1993" ev nîvîs amade kiriye.

Zviyad Gamzaxurdiya intîxar kir

Li gorî agahiya ku jina wî Mananayê, li bajarê Grozny ku, li başûrê Rûsyayê bi daxuyanekê da Ajansa Interfaksê. Gamzaxurdiya li rojavayê Gurcîstanê, ku vê payîzê lê serhildaneke xurt li dar xistibû, ketiye dafika dijmin, ji ber vê yekê xwe kuştîye. Li gorî eynî daxuyanê ev büyer di 31'ê Berfanbarê de pêk hatîye, lê ew agahî ji aliye tu çavkaniyên din ve nehat teyîdkirin, Wezîr Karê Hundîrin yê Gurcîstanê, gote ku haya wan ji vê yekê tune. Niha bi Grozniyê re têkiliyê telefonê nîn e. Gamzaxurdiya pişti serhildana 92'yan ji ber êrişâ hêzên dewletê bêgav mabû ku vekiye vê herêmê. Gamzaxurdiya di Gulana 1991'an de hatibû hilbijartin, lê pişti belavbûna Yekîtiya Sowyetê, Eduard Şivardnadze hikûmdarı bi dest xistibû.

Gamzaxurdiya di meha Rezberê ya 1993'yan serî hilda hinek cihîn girîng jî, bi dest xistin, lê ji ber ku artêşa Rûsyayê bi hikûmetê re alîkarî kir, têk çû. Gamzaxurdiya 54 salı bû.

Meşa Azadî bi serketinî kuta bû

Selîm Biçûk

BRUKSEL- Büyera ku roja 1.1.1994'an qewimîbû hêzek mezin ji bo pêkanîna armancen Meşa Azadiyê ya YRWK'ê. Bi rêxistina êrişâ faşistan ji hêla dewleta Tirk ve û bi destê balyozxaneya Tirkî li Brukselê, rûcikê dewletê ya terorîst ji bo dinyayê eşkere kir. Dost û dijiminan tev nas kir, kî terorîst û kî mafdar e. Kî şer û kî aştiyê dixwaze. Edî her kesî dixwest bêhtir gelê Kurd nas

bike. Şop û şûn di salonê û derveyî salonê de nemabû. Bi sedan rojname, TV û ajans di rojê de dihatin, hevpeyîn bi meşvanan re çedîkirin. Meşa Azadiyê bi giranî ket rojeva dinyayê. Bi sedan dosten gelê Kurd dihatin mesajen xwe pêşkêş dikirin. Ev ji dibû sedem ku dewlet din, har û çavşor bibe. Deng û behsa şoreşa Kurdistanê bû nûçeya bingehîn di hemû dezgehîn ragihandin yên cihanê de.

Planen dewletê ci bûn?

Di roja 31.12.1993 yan de Balyozxaneya Tirkan li Bruselê civînek ji bo hemû komele û saziyên faşistan li dar xist. Nêzîkî 500 faşîstî ji bo pêkanîna provakasyonekê, xwe amade kir. Li dora saet 22.00'yan, dema ku meşvanen azadiyê şîv dixwarin., faşistan êriş anîn ser cihê ku lê diman. Dirûşmeyen li diji gelê Kurd diavêtin. Dixwestin meşvanan bikişinîn şer û qirkirineke mîna ya Sêwazê pêk bînin. Faşîstên ku dewletê amade kiribûn, her awayen

çekîn qirkirinê, mîna demançe, kér, molotof û hwd. bi xwe re hilgirtibûn. Sê armancen dewletê yê bingehîn ji vê provakasyonê hebûn. Yek, ji bo meş negîhîje armancen xwe. Didu, pêkanîna qirkirina 150 rewşenbirê Kurd, sisê, derxistina dewleta Belçika mîna Almania û Fransa li hember gelê Kurd û pêşengîya şoreşa wî PKK'ê. Lî rewşenbirê Kurd ku ji bo van listikan hişyar bûn, ev provakasyon binketi kirin û ji bo xwe kirin hêzeke serketinê.

Meşa Azadiyê dengê gelê Kurd gihad cihanê

Rojen 2-3-4-5.1.1994'an bûn rojîn Kurdistanê. Ji her hêlê ve rojnamevan, TV û ajans bi ser meşvanan de diherikîn. Bi fermî komekê ji meşvanan serdanek ji bo Wezîrê Derveyî Louïs Tobback, êrişen Türkî faşîst bi awayekî tund protesto kir û dewleta Belçikayê wek berpîrsîyar diyar kir ku di vî warî de kîmasî kiriye. Tobback beyan kir ku: "Tirkîye provokasyonan dide kirin bi gruben xwe yên faşîst, ji bo ku Balçika jî wek Almania û Fransayê rêxistinê Kurdistan rade. Armanca me yê wisa tune."

Sporê. Gruben Türkî faşîst nêzî bîst heb bûn û li her deverî êriş birin ser Kurdistan, ta malen Kurdistan.

Wezîrê Karê Derveyî Louïs Tobback, êrişen Türkî faşîst bi awayekî tund protesto kir û dewleta Belçikayê wek berpîrsîyar diyar kir ku di vî warî de kîmasî kiriye.

Tobback beyan kir ku: "Tirkîye provokasyonan dide kirin bi gruben xwe yên faşîst, ji bo ku Balçika jî wek Almania û Fransayê rêxistinê Kurdistan rade. Armanca me yê wisa tune."

Pişti êrişâ faşistan ji Komîteya sazkeriya Meşa Azadiyê İsmet şerif Wanlı, M. Emîn Pencewînî û Timur Sayan seri li Parlementoya Balçikayê dan û hevdîtinan pêk anîn, li ser armanca meşê ew agahdar kirin.

Ji parlementoyê, Willy Cleat jî ev bersivda berpîrsîyarên Meşê: Em tim bi Kurdistan re di têkilikeyen germ de ne. Ji bo ku pîrsîrika Kurdi di nav aştiyê de çareser bibe, em bi ser dewleta Tirk ve diçin

Faşîstan êriş bir ser Meşa Azadiyê

Navenda Nûçeyan- Meşa Azadiyê ku 23'ê Berfanbarê li paytexta Almanyayê li Bonnê dest pê kiribû li Brukselê rastî êrişâ nijatperesten Tirk hat. Gelek rewşenbirê biyanî jî tevî Meşa Azadiyê bûbûn û piştgirîya rewşenbirê Kurd dikirin. Armanca Meşa Azadiyê protestoya li ser zilm û zordarî û qirkirina li ser gelê Kurd a dewleta Tirk bû.

Vê meşê bala gelê Ewrûpayê dîkişand ser xwe û dinyayê tev bi zilm û zoriyê dihesandin. Bi awayekî jî mecbûr diman ku pê bîhesin, Ji ber vê yekê jî dewlet û balyonxana Tirk berî Meşa Azadiyê planen provokasyonan çekiribûn. Ji bo ku bûyereke mezin derîn û Kurdistan pê súçdar bikin. Lî dewleta Balçikayê haya wê ji vê yekê he bû û bi provokasyonen Tirkîne faşîst ne hatin xapandin. Wek ku li çend welatên Ewrûpayê jî pêk anî bûn, li Balçikayê jî gruben Türkî faşîst froşgeh û karxaneyen Kurdistan hilweşandin.

Roja 4'ê Rêbendanê 400 kesîn faşîst êriş birin ser Kurdistan rewşenbir li salona

Nûçeyen Derve- Li başûrê Meksîkayê di 2'ê Rêbendanê de, gundiyan çek bi dest xistin û serî hildan. Ev gundiyan xwe bi Artêşa Rizgariya Nete-weya Zapata (ARNZ) didin nasîn û bi hikûmetê re hevdîtinekê bi tu awayî napejîrinin.

Gundiyan bi çek pêşî 6 qezayan bi dest dixin lê, pişti ku leşkeren hikûmetê mudaxeleyi wan dîkin, di navbera wan de lihevxitinek çedîbe. Di vê lihevxitinê de, li ser hejmara mirian, kes nikare hejmareke qethî bide. Hejmara ku hikûmet dide; 86 e, lê rîveberêkî ku ji paytexta Chiapasî Tuxtla Gutierrezê ye, hejmara mirian ji 150 kesî zêdetir dide xuyan.

Gundiyan bi çek, armanca serhildana xwe wiha diyar dîkin: "Reforma axê, mafêne xweçihî û lihemberderketina Peymana Ticaret Serbest ya Bakurê Amerîkayê (NAFTA)"

Pişti ku di 1'ê Rêbendanê de Peymana NAFTA'yê kete

rojevê, gundi serî hildan û bi hikûmetê re ke-tin lihevxitinê û 6 qezâ jî dagir kirin. Lî pişti 3 rojan, ji 2 qezayê vedikişin.

Çavkaniyên dewletê hejmarâ van gundiyan 400 kes, rojnamevan navbera 800 û hezar kes, gun-dî jî vê hejmarê 5 hezar kes didin nîşan. Di Eyaleta Chiapasî de, hejmara hêzên dewletê ji 12 hezar kes in. Li gor nûçeyen dawî ARNZ hemû hêzên xwe vekîşandin serê çiyayan.

Ev gundiyan serhildêr, ji xwe re şoreşgerê Meksîkayî Emîliano Zapata mînak digirin. Tê zanîn ku Emîliano Zapata di navbera sala 1910 û 1917'an de, bi gundiyan re serî hildabû û bi hikûmeten



Emîliano Zapata



Her çiqas gundi li hemberî bêheqiyê rabun, dîsa jî bi ser neketin.

Xelata Wêjeya Nobelê Rigobertha Menchu, daxwaza xwe bi daxuyaniyekê anî ziman: "Ji vê pîrsîrikê re, çareserkerîna siyasi ya aştiyê divê bê dîtin û pêwist e ku, pêşî li ser pîrsîrikê mafêne gelên xweçihî bê sekinîn."

Li Meksîkayê li hember pêkutiya hêzên dewletê

Serhildana gundiyan şoresger bi ser neket

rojevê, gundi serî hildan û bi hikûmetê re ke-tin lihevxitinê û 6 qezâ jî dagir kirin. Lî pişti 3 rojan, ji 2 qezayê vedikişin.

Çavkaniyên dewletê hejmarâ van gundiyan 400 kes, rojnamevan navbera 800 û hezar kes, gun-dî jî vê hejmarê 5 hezar kes didin nîşan. Di Eyaleta Chiapasî de, hejmara hêzên dewletê ji 12 hezar kes in. Li gor nûçeyen dawî ARNZ hemû hêzên xwe vekîşandin serê çiyayan.

Ev gundiyan serhildêr, ji xwe re şoreşgerê Meksîkayî Emîliano Zapata mînak digirin. Tê zanîn ku Emîliano Zapata di navbera sala 1910 û 1917'an de, bi gundiyan re serî hildabû û bi hikûmeten

wê demê re ke-tibû şer.

Rêveberêkî hikûmetê dibêje ku, di nava van gundiyan serhildêr û

çepen Guatemalayî û Amerîkaya Navîn de girêdahiyek heye û kesen hemwelatiyên biyan ku di nava endamên EZLN'ê de hene wan protesto dikin.

Ji aliyê din ve jî, Xwedîyê

Nûnerê ERNK'ê yê Yewnanîstan Hasan Dağ: 'Armanca me ya dawî Kurdistaneke serbixwe ye'

Navenda Nûçeyan- Nûnerê ERNK'ê yê Yewnanîstanê Hasan Dağ û Berpirsiyarê Komîteya Kurdistanê ya Brukselê Yado Doz û Nûnerê ERNK'ê yê Yewnanîstanê Hasan Dağ, armanca şerê çekdarî wiha diyar kir: "Qonaxa dawîn ku me daye ber xwe bi destxistina Kurdistaneke serbixwe ye, dibe ku berî vê, qonaxeke awarte ku tê de gelê me xwediye dezgehîn rîveberiyê û mafê çandî ye, pêk were.

Li gorî nûçeya **Ajansa Kurd-A**'yê ku roja 2'yê Rêbendanê weşand, Dağ û Doz dadixuyînin ku, tevgera rizgariya Kurdistanê ji bo 94'an pêkanîna hilperîneke giştî daye ber xwe û wê gerîla berê xwe bide nîşangehîn aborî yên KT'ê û wê giraniyeke mezin bidin xebatên diplomatik. Wan got ku, di sala 94'an de wê herêma rizgarkirî pêk bînin û pişti vê jî wê parlementoya neteweyî ava bibe. Dîsa li gorî vê daxuyaniye di sala 94'an de wê hejmara gerîyan jî du qat bibe.

Berpirsiyarê Komîteya

■ Berpirsiyarê Komîteya Kurdistanê ya Brukselê Yado Doz û Nûnerê ERNK'ê yê Yewnanîstanê Hasan Dağ, armanca şerê çekdarî wiha diyar kir: "Qonaxa dawîn ku me daye ber xwe bi destxistina Kurdistaneke serbixwe ye, dibe ku berî vê, qonaxeke awarte ku tê de gelê me xwediye dezgehîn rîveberiyê û mafê çandî ye, pêk were.

Kurdistanê ya Brukselê Yado Doz û Nûnerê ERNK'ê yê Yewnanîstanê Hasan Dağ, armanca şerê çekdarî wiha diyar kir: "Qonaxa dawîn ku me daye ber xwe bi destxistina Kurdistaneke serbixwe ye, dibe ku berî vê qonaxeke awarte ku tê de gelê me xwediye dezgehîn rîveberiyê û mafê çandî ye, pêk were.

Li di vê qonaxa awarte de, gerîla çekên xwe danayne û ERNK ji xebatên xwe didomîne."

Wan der heqê xebatên diplomatik de û êrîşen KT'ê yên bi ser dostêن gelê Kurd ve ji nirxandin: "Heke kîjan

dewlet bi çavê "terorîst-bûn" li me nenêre û der heqê doza me de têgîhîşti be, Tirkîye wê dewletê bi alîkarîkirina PKK'ê sûcîdar dike. Niha tu pêdiviya me bi alîkarîya Yewnanîstanê nîn e. KT'ê ku bi ci çavî li Yewnanîstanê dinêre û sûcîdar dike, wisa ji dewletên wek Belçikayê, Holadayê û Danîmarkayê ji dinêre û êrîşî wan dike; ji ber ku ew dewlet naxwazin dijminatiya gelê Kurd bikin."

Di vê daxuyanê de dîsa tê gotin ku, Tirkîyeji bo ku Almanya û Fransa PKK'ê qedexe bikin, tavîzîn mezin dane wan dewletan.

■ Şahiya sunetê ya ku ji bo piştgiriya rojnameya Özgür Gündemê hatibû sazkirin, di roja 5.1.94'an de li devera Osmanbeyê, li Salona Labelayê çebû. Di şahiya sunetê de tevî komên cihê, gelek kes ji ji gel besdar bûn.

ku lawê hunarmendê Koma Amed Serhet e, gelek komên muzîkê yên ji derî NÇM'ê ji besdar bûn.

Şevê bi giramgiriya deqîqeyekê li ser piyan ji bo şehî-

dan dest pê kir. Dû re Bernamîye bi folklorâ NÇM'ê Koma Serhildan dom kir. Ji bo piştgiriya rojnameya Özgür Gündemê, Fırat Başkale, Gûrup Kızılırmak, Metin Kahraman û Hozan Gülbahar, bi stranên xwe yên şoşegêr û yên dilanê besdaran şâ kirin. Şanoya Jiyana Nû skeçek bi navê Qirik, Koma Çiya, Koma Rojhîlat, Koma Azad, Koma Amed, Hozan Xanemîr û Ganî Nar bi hev re çend stran pêşkêşî mîvanan kirin.

Di şevê de nebûna yek berpirsiyar ji rojnameya Özgür Gündemê û axaftin nekirina li ser rewşa hilbijartînê ji alîye Partiya Demokrasiye (DEP) ve, bala gelek kesan kişand û wek kîmasyekî hate nirxandin.

Salîh Günbat

Şahiya sunetê ya ku ji bo piştgiriya rojnameya Özgür Gündemê hatibû sazkirin, di roja 5.1.94'an de li devera Osmanbeyê, li Salona Labelayê çebû.

Dîlana ku bi armanca piştgiriya bi rojnameya Özgür Gündemê hate kirin, ji alîye Navenda Çandê ya Mezopotamyayê ve hatibû birêxistin. Di şahiya Suneta Armanc de



Dîmenek ji şahiya piştgiriye ya ji bo Özgür Gündemê


Alinak ji DEP'ê istifa kir

Navenda Nûçeyan- Mebûsê Partiya Demokrasî yê bajarê Şîrnexê Mahmut Alinak, ji partiya xwe istifa kir. Daxwaznameya İstifakirinê ji Sekreterê Giştî yê DEP'ê re şand û xwest ku ev daxwazname, di 3'ê Rêbendanê de bê hesibandin.

Li gorî beyanata Alinak di 30.1.1993'yan de, daxwaznameya istifakirinê daye, lê hem ji Serokê DEP'ê û hem ji, ji Serokê Meclîsa Tirkîye (TBMM) itiraz çebûye.

Alinak, dibêje ku ew daxwaznameya xwe îptal kiriye, da ku nebe muhatabî hin ihamîn nerast. Li gorî gotina Alinak, ger Dadgeha Bilind biryara girtina DEP'ê bide, dê mebûstiya wî ji, ji destê wî derkeve.

Wek tê zanîn ku Alinak di 30'yê Sermawezê de daxwaznameya istifakirinê dabû rayedarên DEP'ê. Pişti şandina daxwaznameyê wî daxuyandibû ku neyê qebûkîrin, wê mewziya parlementoyê ya girîng ji dest biçe.



Ebûqatan nexwest wêneyê tewanbaran bê kişandin

Navenda Nûçeyan- Darizandina 124 kesen ku, bi pêkanîna qetîfama Sêwazê tên súcdarkirin, roja 3'ê Rêbendanê dom kir. Wek her danışına darizandinê, dîsa di salona dagehê (DED'a Enqereyê) de xirecir derket.

Pêşî ebûqatên bersûcan, xwestin kesen ku wêneyan dikîşînîn derkevin derve, gotin ji bilî endamên çapemeniyê kesen ku wêneyan dikîşînîn hene, pişti re ji nûçegîhanîn (muxabîr) televizyonen Almanî, VDR'ê û ARD'ê nîşan dan. Dîsa bersûcan idia kirin ku, lêzimên kesen ku di bûyerê de mirine ji wan re çerî kirine. Li servê yekê Serokê Lijneya Dadgehê Muammer Ünsay got: "Sêwazeke nû li vir ji pêk neynin." Di danışına pişti nîvro de, hinek bersûcan ifade dan, gotin ku işkence dîtine û tevî bûyerê nebûne. Li serv ê yekê ebûqatên maxdûran hinek wêneyen ku, idia wan pûç dîkin pêşkêşî lijneyê (heyet) kirin.

Gelek mirovîn navdar besdarî danışînê bûn. Sekreterê Giştî yê SHP'ê Halîl Çulhaoğlu, Mebûsîn SHP'ê Azîmet Köylüoğlu, Ziya Halîs, İbrahîm Yerlîkaya, nivîskarê Almanî Günther Wallraf, Rolf Stolz Schriftsteller û endamên hinek komeleyen Elewiyan û saziyen mafê mirovan.

Dadgehê 20 meh ceza da Münîr Ceylan

Navenda Nûçeyan- Sekreterê Giştî yê Sendîkaya Petrol-İş'ê Münîr Ceylan, ji bo nivîseke xwe ya di 21'ê Tirmeha 1991'an de, di rojnameya Yenî Ülkeyê de weşandibû ji alîye daîreya cezayê ya nehemîn ya darizandinê bi 20 mehan ve hate cezakirin.

Münîr Ceylan di nivîsara xwe ya di Yenî Ülkeyê de, der barê "qanûnê terorî" de wiha nivîsibû: "Li rojhîlat û başûrê rojhîlatê Anadolîyê terora dewletê her diçê zêde dibe. Ev bûyer lîstikeke İmparîyalîstan û bi şeweyen navneteweyî li ser gelê Kurd didome." Bi vê nivîsarê Münîr Ceylan di hemû deveran li hember qanûnê ji terorê alîkarî û yekîtiyê dixwaze. Li ser vê nivîsê Dadgeha Ewlekariya Dewletê Münîr Ceylan bi 20 mehan da cezakirin. Li ser vê biryara anti demokratik û fermî gelek rîexistin û kesen pêşverû reaksiyonen xwe dan kirin. Serokê Giştî yê Türk-İş'ê Bayram Meral, Sekreterê Giştî yê DîSK'ê Süleyman Çelebî, Serokê Giştî yê Tüm-Bel-Sen'ê Vîcdan Baykara biryara Dadgehê protesto kir.



Seminera ciwanan

Navenda Nûçeyan- 2'yê Rêbendana 1994'an Komîteya Xorten DEP'a Eminönüye li rîexistina DEP'a navçeya G.Osmanspaşayê semînerek çekir. Zimanzan Torî û Serokê DEP'a Eminönü İbrahim Yaman ji besdarî wê bûn. Giraniya naveroka semînerê li ser dîroka Kurdi bû. Zimanzan Torî ji xorten besdar re li ser dîroka Kurdi axivî.

Serokê Komîteya Xorten Nurcan Uçar û sekreterê wê ji dane xuyakirin ku armanca wan hînkirina dîroka Kurdi bi xorten Kurdi e.

Rayedarên komîteyê wiha peyivîn: "Xorten me ku ji alîye dewleta Tirk ve hatine asîmîlekirin tenê xwe Kurd dizanîn ev ji xort û ciwanen me re kîmasyekî mezin e. Divê em giraniye bidin dîroka Kurdi, bi ciwanen xwe bidin hînkirin ji bo ku ev cemedâ ser wan bihele."

Çirok

Fener Rojbiyanî

Çemê Efrînê îsal ava wê gelek e, tiji mîl û herî ye. Zivistanê gelek sar û seqem e, berfa li serê çiya û zozanan hê neheliya ye. Rengê spî mîna kultûs e serê nimêjkeran vedibiriqe û bi hetaw re ketiye keneke xwesik û şîrîn.

Ciyayê Zoyê Gira bi serhemê xwe yê spî, ji nav gelek çiyayen devera Efrînê hildide. Di navbera van çiyayan de Çemê Efrînê ji bakurê welêt diherike û hedî hêdi bi şanazî riya xwe diqelişîne. Li herdu rexên wê du rêzên kesk têne xuyan, çayir û çimîn li beramberî êrisen qûmê sekînîne û mafûrek sewz li hawidorê raxistiye. Li rexê çepê yê çem, gundê Berave xwe avêtiye sînga çiyayekî. Çiya ew hembez kiriye û di sînga wê de ketiye xeweke şîrîn. Belê li gundê Berava biçûk û li hawidorêne wê, daristanek ji darê merxê û rûl, hejîrên bejî, li hember çavên gund re, çem bi hêsanî ji navika firkên çiyayî direve û derbas dibe. Ji serî sirtekî sor û bilind bi xumîn, guşînî ji Solave Meydankê tê xwarê. Li nik çemê qirecir e û dengê keç û zarokên gund ên nazik û perî tê. Hin ji wan ketine ber şûştina cil û bergen, hin kûzên ave dane ser mil û piyan û berê xwe dane malê.

Darêñ rûlê, li herdu rexên çem belav bûne, mîna dûrgehêñ sewz û aravî. Xule xula avê narînek xweş ji pêlîn wê saz dide û keçen gund li tenîşa çem bi stran û çepikan ketine semayê, di gel deng û awaza xule xula avê.

Bêrivanê pişta xwe daye da reke hinarê û li pêşîya xwe dinihêre û kûr dirame. Zeyneb ji paş Bêrivanê ve hat û herdu milêñ wê girtin û hejandin. Bêrivanê ji ber wê jî tirsî û veciniqî, rengê sîmane wê sor û zer bû. Zeynebê got :

- Ka mizgîniyê bide min.


Mizgîniya çî?

- Li cem min, tiştek ji bo te heye. Tu dizanî ew çî ye?

Bêrivanê bi nirce nirç serê xwe hejand, jê re şanî kir ku ew nizane.

- Birayê min, ji te re name ji Helebê şandiye.

Bêrivan mîna yê ku yeqîn nekiribe name ji nav lepêñ Zeynebê dizi û berê xwe da gund. Wê ji bîr kir ka ji bo ci berê xwe da çem, wê hemû tiştên xwe li wir hiştin, guhê xwe nedâ bangê hevalan û mîna birûskan gihîste malê, vir de wir de li ser pêçiyen lingan derbasî hundirê malê bû. Li dor paş xwe nihêri û bi destê rastê de riye textî tê veda, derî li ser pişte vebû, li quncikekî rûniş,



destê rastê xiste paşila xwe û name jê derxist. Bi çavên tiji hêvî û evîn, Bêrivanê name û rêzên wê peyv bi peyv dixwend. Rû û sîmanê wê rengek sor vedaye, peyvîn bi eşq û evîn di nameyê de dagirtibûn.

Li dawiya nameyê Mamed wilô nivisandibû: "Pişti azmûnê, ezê bizîvirim gund, ew meseleyen han ku, te di nameya xwe de ji min re behs kiri-bûn. Hinekî li ber xwe bide, em ji hev re ne."

Ji nişka ve derî vebû, Bêrivan tirsî, destê xwe xiste bin mînderê da ku nameyê ji ber çavên diya xwe veşere.

- Qîza min te ci got? Malik li benda xeberekê ne.

Bêrivan bi hêrs cilê xwe girt û bi giriyeş şewat ji diya xwe re got: "Ez wî ji xwe re nakim mîr. Kal e, navsal e, qasî bavê min tê."

Bêrivan xwesteka Nasir e, dikin û nakin çare tune ye. Nasir bi xwe mîrê xwişka wê ya rehmetî ye, ew ji li ba xwişkê, li ber destê Nasir bejin daye. Diya wê bi hêrs got: "Bi Xwedê, bi pêxember eger apê te van gotinê vala bibihîse, wê serê te hilqetîne."

Çi li ber destê wê ket girt û bi ser keça xwe ket. Bi hilekîş got: "Ez...ez...eeeezzzê bişînim li pey apê te yê teres, bila ji heqê te derkeve."

Bêrivanica baskîkestî, mest û melûl ma, ew bi stûnê xêni ha-te girêdan. Bisk û keziyên he-nekirî bi ser milêñ wê ve hatin xwar.. Keça bejnrihan, çav ji hungivê Bilisê ne, lêvîn sor mîna gangulîkên Deşta Cümê. Bi herdu biskîn reş û dirêj girtin û li dor stûyê wê gerandin, dixwazin bi biskîn şîrîn Bêrivanê

û av ji devê wê dertê. Diya Bêrivanê hebek dilerm bû, şewat û dilovanî kete dilê wê, xwest tiştek bike, lê ji tirsa newêri devê xwe veke. Apê wê ji nû ve kire ire ir û misasa xwe li ba kir, digot gerek e razî bibe, eger razî nebe ezê wê bavêjim ava binê pirê, bila ji masiyan re bibe xwarin. Bi dengekî bilind got: "Qîzê, tu ra-zî bûyî hal!"

Kire time tim, hêdîka axîfî: "Na..na..na! Naxwazim."

Bi tiji dengê xwe bang kir û ferman da peyayen xwe û got:

- Wê vegeŕîn mal, wê sibe razî bibe, lê bi rengek din.

Tariyê xwe li ser gund re raxist. Hêmin li her derê belav bûye, li ser rez û zeviyên gund belav bûye. Bi tenê dengê qure qura beqan ji nav çem tê. Xweli bi ser çavên wê berdan, deriyê bûkê lêkîrin û bi darê zorê û tirsê li ser pişta kerê bi rûnişkîrin dan. Diya wê, jinapa wê û gelek ji jinêñ gund jî, li pey wan ap û zilamên xwe tê. Bi çavên tiji hêstir û bi giriyeş nizim çiqinê xwe girtiye, ew ji halê rihe wê ye. Niha berê xwe didin mala Hiso ku li rojhîlatâ gund e. Karwanê şahîye mîna meşa mirineke bêdeng diçin, li ber deriyê teneke rawestîyan, bi seriyê mi-

sasê li derî xistin. Segek kuf-torî yê Hiso kî-re ewte ewt û bi rayandin û hejandinê, dû-re li ber derî rawestî, pêşewaziya wan dikir. Hiso yê piştxûz ji xanî derket û li ser sewkiyê rawestî û şeyê destê xwe da ber e-niya xwe û bi horanî nihêri û got: "Kî ye ew?"

Were emanetê xwe bigire. Min Bêrivan ji te re aniye."

Li ber derî axaftinek bi lez teví danûstan-dineke nedîyar çêbûbû. Xatir ji hev xwestin û bi rê ve cûn û Bêrivan ji, qederek veşartî his-tin.

Bêrivan di quncikekî de, li ser nivîneke kevin rûniştiye û li bejna Huso dinihêre, rûyên qurmiçî, rihen spî û dirêj, piştek qûz, destcîrifî, ew gelek navsar. Li hundirê malê dest bi şêlandina cilê xwe kir, derhal reng li sibehê Bêrivanê sor bû û ji fedîbûna, xwe bi sun ve ki-

şand, pişt û dîwar bûne yet.

- Tu ji Xwedê natîrsî, ez wek qîza te me.

Huso xwe bi tiştekî mijûl kir, ji ber ku wî nedixwest van go-tinan li ber guhê wî bikevin. Doxîn sist kir, şalwar ji xwe avêt, niha ew wek çawa Xwedê daye, darekî tazî ye, hestiyen milen wî mîna du çyan ber bi jor ve çûne, xwe nêzîkî keçikê kir û destê xwe avête porê wê, lê Bêrivanê ew nehiş û bi herdu destê nerm tê veda û li ser pişte gér bû, li ser mafûrê zike pişt tol bû. Wî hêz da xwe ta ku mîraniya xwe ji nû ve kom bike, lê wî hew dikaribû. Bi inte int hêz da xwe, da ku li ser ni-ga bisekine, lê kabêñ wî bi wî re alîkarî nekirin û di dilê xwe de got: "Xweli li serê te be, tu bi qîzékî nikarî, mîraniya te li ku ma? Rojîn ciwaniyê cûn ne-ma tê." Ew ji ber kir yara xwe sermezar bû û serê xwe yî lot û mezin, xiste ber lingê xwe û di halê xwe de kûr fikirî. Çavêñ wî li her çar aliyên mal digerin, ew li cilê xwe digeriya, pişta xwe da dîwarekî û destê xwe xiste bêrîka şalwarê xwe û ji qutiyê tûtin derxist. Bi tife tif ci-xareyek ji xwe re pêça, vêxist. Nefesek kûr kişand, serê xwe bi jor ve hilda, dûmanekî dirêj ji devê xwe berda, xelek li pey xelevî dûman bi jor ve dicû.

Çemê Efrînê îsal ava wê gelek e, tiji mîl û herî ye. Zivistanê gelek sar û seqem e, berfa li serê çiya û zozanan hê neheliya ye, rengê spî mîna kultûs e serê nimêjkeran vedibiriqe û bi

hetaw re ketiye kenekî xweşik û şîrîn.

Ciyayê Zoyê Gira bi serhemê xwe yê spî ji nav gelek çiyayen devera Efrînê hildide.

Di navbera van çiyayan de Çemê

Efrînê ji bakurê welêt diherike û hedî hêdi bi şanazî riya xwe diqelişîne.

ezman nihêri, ezmanekî sayî ti-je stêrk, bêhnek kûr kişand, Bêrivan serbest bû.

Pişti wê şeva giran, ber dengê azîna meleye gund û li ser dengê dik, li pînekê xwe sekinîne. Xelkê gundê Berava li ser xebera reva Bêrivanê û Mamedê ji xew şiyar bûn. Ew diçine Helebê, lê nizanîn li ser reva wan ci bi serê herdu malbaten Bêrivan û Mamedê hatiye.



Ji rojê eşkeretir e ku belgeya bûnê û mafê hemû gelan li ser vê dinyayê ziman e.

Hejar

Hemo çû semerê hat dîsa kerê berê

Nav havînê bû. Zilam û ber-maliya xwe ji mîrgê dihatin. Lawikên wan Ehmed bi rev hat pêsiya wan û got: "Bavo, dayê! Meta min û mîrê wê Hemo hatin."

Piştî lihevpirsînê xwediyê malê ji Hemo pirsî: "Ê Hemo, hûn çawan in, herçî kesen ji vir çûne li hevdu dibin xwedî?"

Hemo bersiv da: "Tu were li bacana! Were li îsota! Were li kawen û zebeşan! Were li nanê firinê! Ki dixwe! Pirî wan jî davêjin ser sergo. Lî merû (mirov) nikare bide kesî. Her tişt pere ye. Bibêje ji heftsalî bigire het-a pêncâ salî diçin (terin) şixul."

Bermaliyê bi tînaz (henek) got: "Wî mala minê tu cîma aha (wisa, wi-lo) heliyayî."

Hemo axînek kişand û got: "Gere mirov li wir wek xiltê kor be, min carê pel û pot tov dikirin li ser sergo. Potê nû ha! Paşê ve tiliya min ra-girt."

Xwediyê malê: "Zarokê te çi dikin? Zevt û zorê dibînin an na?"

Hemo: "Lawik wek bizot e. Ez tim jê re dibêjim lawo, bi zarokê memûran, polisan û Tirkan re bibe heval! Em



qala Dilbirîn kiriye. Kanê Dilbirîn?"

Ehmed niuçand bavê xwe û di guhê wî de wiha got: "Bavo nebêje kekê min çûye çiyan. Hevalê min carê ji min re gotin, ên ku çûne şehran (bajar) mirov piştê pê girê na-de. Bi derewan bibêje Dilbirîn çûye Stenbolê." Xwediyê malê bi kurê xwe şâ bû.

Jin (pîrek) çûn kulînê. Hêwiye ji bûka xwe re got:

"Wî hîn cilê qilêri diavêjin ser hêstêr? Lîlê ev toraq, rûn ew-qas pirr tu cer dikî, te cîma nefirotiye? Wele şeher xweş in, lê min pirr bêriya berîvan-tiyê, toraqê û welat kiriye."

Bermaliyê bersiv da: "Erê dayika min, erê! Şeher xweş in! Bindestî çi wext bû xweş. Çavê min kor bin, kî dizane niha cer dikin... Ev toraq û rûn para keçik û xorten dilovan e, para egitan e..."

Qiseyê (peyvîn) bûkê li xweşiya hewiyê neçûn. Xwe tal kir û medê wê çûn. Bi sero poz got: "Min ji Hemoyê dîn re got jî em neçin, ka aqil...!"

Wexta xewê râbûn râkevin. Xwediyê malê û bermaliyê xwe li ser cihê xwe mijûl bûn.

Bermalî: "Te ji hatina wan ci fêm kir? Ê min bi xwe dibêjim belengaz dîsa hatine parsê. Bi Xwedê, ez pariyek toraqê nadim wan. Ji Ehmed re çavreşî dikim, îca man ew."

Xwediyê malê bînekî li ci-xarê xist, axîn kişand û got: "Hemoyê me çû semerê, hat dîsa kerê berê."

Jêhat Gimgi

Dogân Gûzel

Jûjî...



KÊ CI PEKAND?

Enflasyon dike ku dakeve.

Tansu Çiller

(Serokwezîra Komara Tirkîyeyê)



Amed bi hetekiya mesrefa Generalê qol û Çillerê helikî

Milli Piyangoya te pîroz be Çiller xanim. Wek ji dilekî ku hesret dikemand, wek kezebgurekê ku bêriya kezebênen xwe dayikên ji dil yêni li xerîbiyê ku bi salan ji zarokên xwe dûr mabe, li paytexta Enquerê, li balefirekê siwar bû, berê xwe da paytexta zarokên xwe, zarokên Kurdistanê.

Li Amedê şewîfîbûn zarokên Kurdan, ku berê çendekî bi emrê Xanimê parçeyekî ji Amed, wêran û bi ser serê zarokên Kurdan ve hatibû hilweşandin. Wek ku ne wê ev bajar, xan û malen wan bi ser serê wan ve xerab kiribe.

- Lawno! Zarokno! Berxên mala min ez hatim pîroziya sersala we. Sersala we pîroz be..

Zarokên wê jixwe dengê wê nebirin xwe û li wê jî nenihêrtin, ji xeynî çerîd bêbavan.

Ji ber ku xwîna dayika wan ji wan re nedikeliya, zarokan fêm kiribûn ku ew ne dayika wan e, ne jî, jinbava wan e.

Gotineke Kurdan heye ku dibêjin: "Bêhna diyan tê ji xatiyan." Bêhna xatiyan jî, ji wê nedihat. Lî tim dibêje ku ez dayika zarokên Kurdan im. Ne tenê yêni zarokan, yêni pîr û kalan jî. Lî tu car zarokên Kurdan ew ji xwe re nepejîrandine wek dayik, xaltik, metik û ne jî pîr û kalan, ew ji xwe re pejîrand wek xwiş, ew e ku hema bûye teniya bi don ji zarokên Kurdan û ji Kurdan naçe.

Piştî şevbora Millî piyangoyê, tol û tolazên xwe da dû xwe li balafirê siwar bû berê xwe da Enquerê.

Amed li wê teng bûbû, bûbû strînresk û di canê wê de diçikîyan, êdî hew hedan dikir li Amedê. Şevborkî sersala bi Generalen qol re li Enquerê xweşir bû.

Bi gihiştîina Enquerê re spîker mîkrefon dan ber devê wê.

- Ma gelo sersala te çawa derbas bû li Amedê?

- Av cara pêşin e ku ez diçim zarokên xwe hembêz dikim. Ez bi hembêzkirina zarokên xwe zehf dilşah bûm.

- Ma çitika Millî Piyangoyê çawa derbas bû?

- Welle baş derbas bû, bi nas û dostan ve li şeva çitikê (çekiliş) bûn ta derengiya şevê û em vegeriyan Enquerê.

S. S. Dilpolo

Kes nikare ji Xanî dilê xwe bigire

Dibêjin Mîrê Botan, her şev li dîwana xwe zana helbestvan û rewşenbîrên Kurd dicivandin. Yek ji wan yêni ku her şev besdarî şev-buhêrkê dibû, bêyi hatina wî civîn sar dima. Ehmedê Xanî bû, mîr hurmeta wî dirgirt û ew dida pêş.

Weke her carê, rojekê Mîr dişine pey Xanî, lê Xanî ji bîr kir wê şevê here civînê. Mîr berî her kesî pirsa wî kir, lê ew di nava civatê de nexuyabû. Ev yek bi Mîr nexweş hat û dilê xwe ji Xanî girt. Çawa ew nehatiye şevbuhêrkâ Mîr!!

Ü dawiyê biryar kir xwe ji Xanî bixeyidîne û hew bişîne pey wî!

Cend roj çûn hat, bîra Xanî, ku mîr şandibû dû wî. Îcar xwest here bal Mîr ve, bexşînê (lêborînê=efû ye) jê bixwaze... Derbasî dîwanê bû, Mîr çav lê ket, berê xwe jê zivirand û pişa xwe dayê...!!

Hêma Xanî bi kêf got: "Min bihîstî mîr ji min xeyidiye, lê xuya ye ne rast e. Mîr ji min ne xeyidiye!"

Mîr bi kerb lê vegerand; bê ku lê binêre:

- Tu çawa dibêji ez nexeyidime!?

Lê vegerand:

- Ji ber ku ez zanim tu pişa xwe tu car nadî dijminê xwe!!!

Vê bersiva jîr kîfa Mîr anî û xeyd ji navbera wan rabû.

Jan Dost

Di hilbijartinê Adarê de li Kurdistanê

Hedefa dewletê DEP e!

Zana Farqînî

Partiya Demokrasiyê (DEP) ji roja avabûna xwe ve ta niha êrîş, cerd, pêkutiyen dewletê yên bi her awayî li ser xwe dibîne. Dewlet bi helwesta xwe ya li ser Partiya Keda Gel (HEP) ku hate girtin, diçe ser DEP'ê jî. Bi nêzîkbûna mêtûya hilbijartina ji bo belediyan re, ev kirinê dewletê hîn bêhtir dîbin. Gemaroyê (ablûka) her diçe li DEP'ê teng dîkin.

Tîrsa ku DEP wê di hilbijartina de li Kurdistanê li hemberî partiyen pergalê (sistêmê) bi ser bîkeve, kir ku Lijneya Ewlekariyê ya Dewletê (MGK) li ser hilbijartina qerar bide. Lijneya Ewlekariyê ya Dewletê (LED) ji bo partiyen pergalê pêşniyar kir ku li Kurdistanê bi hevîşkî (musterek) berendam li dijî DEP'ê derxin. Lewre tîrsa wan ew e ku encama hilbijartina ji bo Kurdistanê wek referandûmekê bê nîrxandin.

TIRSA JI ENCAMA HILBIJARTINÊ

Niha ji bo ku li Kurdistanê DEP'an jî berendamên serbixwe di hilbijartina meha Adarê de bi ser nekevin, partiyen siyasi tevî Lijneya Ewlekariyê ya Dewletê li çareyan (!) digerin. Çareyeke jî ev e ku li gorî mercen (şert) deveran berendamekî partiyekê destek bikin.

Jî rayedarên leşkeri ta bi Serokkomarê Tîriyeyê Süleyman Demîrel ve, ger di axafîtinê xwe yên bi çapemeniyê re û ger bi daxuyaniyê xwe ve, vê helwesta xwe diyar dîkin ku, wê bi her awayî rî li ber berendamên DEP'ê û yên serbixwe bigirin. Vê yekê jî wê bi navê "endambûn" an jî "têkiliya bi PKK'ê re" bikin.

Süleyman Demîrel bi hevpeyîna xwe ya bi Hasan Yalcın re, ji bo rojnameya Aydinlikê, dida diyarkirin ku wê têkili hilbijartînê bibin. Demîrel dadi-xuyîne ku di dawiya hilbijartîne de kesen ji DEP'ê an jî serbixwe bi ser ketibin û bibêjin, "Em endam û aligirîn PKK'ê ne" jî nayê qebûlkirin; ji ber ku beriya hilbijartîne nedane xuyan û bi wî navî neketinê, lewma encam wek referandûmê nayê pejirandin.

Di hevpeyîna xwe de Süleyman Demîrel pê de diçû û wiha dibeje: "Em nahêlin ku berendamên PKK'ê bikevin hilbijartînê û emê nehêlin bi serê bikevin jî."

Ev nehiştin û râlibergirtin ji niha ve xwe dide nîşan. Li herêmê cerd û pêkutiyen li ser endam û râvebirê DEP'ê sift û gurr dîbin. Gef li wan tê xwarin, têne girtin, ziyan li mal û derdorêne wan dibe. Wek mînak Tûxgeneral Korkmaz Tağma ku navê vî di gelek bûyeran de derbas dibe, bi awayekî eşkere serokê partiyen li Tetwanê li hev dicivîne, ji wan

■ Ji bo ku li Kurdistanê DEP'an jî berendamên serbixwe di hilbijartina meha Adarê de bi ser nekevin, partiyen siyasi tevî Lijneya Ewlekariyê ya Dewletê li çareyan (!) digerin. Çare jî ev e ku li gorî mercen (şert) deveran berendamekî partiyekê destek bikin.

navê berendamê DEP'ê dixwaze û dide "fêmkirin" ku wê pêşî li ber wan bigire.

TEDBÎRÎN DEWLETÊ

Li Kurdistanê karê peydeki-rina berendaman ji bo serokatiya belediyan Lijneya Ewleka-

- Cûyîna hêzên dewletê ya ser sandoqê bi çek û cilêñ fermî...

Li gorî diyardeyên jorîn wisa dixuye ku dewlet hilbijartînê li Kurdistanê ji xwe re kire meseleya man û nemanê. Welê tê dîtin ku ci ji destê wê were ji



Çapemeniya Tîr, her bela xwe di Serokê DEP'ê Hatîp Dicle dide

bo biserketina berendamên xwe û biserneketina yên din texsîr nake. Hemû rî jî, ji bo hêza serwer jîxwe rewya ye!

DEP Jî Jî BO WAN WEK HEP'Ê YE

DEP ji roja avakirina xwe (17 Gulan 1993) ta niha, jî yek parlementer, 8 endam û râvebirê xwe di têkoşîna xwe ya demokrasiyê de daye. He-ma hemû rêxistinê wan û navce, nehye û bajaran para xwe ji pêkutî û cerdê hêzên dewletê standine, endam û râvebirê wan hatine girtin, binçavkirin û ziyanê maddî gihiyane wan.

Ev rewş dide xuyan ku ci a-qûbeta hatîye serê Partiya Keda Gel (HEP) ku ji aliye Dadgeha Qanûnê Bingehîn ve deriyê wê hate radan, tê serê DEP'ê jî, ku ji der û dorêne ji hev cihe hatîye pê.

KUŞTIN, GIRTIN, BIRÎNDARÎ...

Pesta dewletê li ser DEP'vanan her diçe bêhtir dibe, ji bo ku çavêne wan jî bê tîrsîn her ji kirinê xwe namîne. Ta niha ji DEP'ê kesen ku di encama liv-bazîyen çekdarî jîyana xwe winda kirine ev in:

- Li hin herêman destekkîna berendamê partiyekê

- Li cem hev civandina malbatê cerdevanan

- Rêlibergirtina besdarbûn û serketina kesen derveyî partiyekî kîşkîrî

- Navendîkirina sandoqen hilbijartînê li hin herêman


2. Mehmet Yaşar (Endamê Lijneya Rêveberiya DEP'ê ya Batmanê): Di 1.7.1993'yan de li Batmanê hate kuştin.

3. Mehmet Yesil: Li Batmanê di 19.8.1993'yan de hate kuştin.

4. Musa Ak (Amed, delege)

5. Habib Kılıç (Endamê Lijneya Rêveberiya Bajarê Batmanê): Di 2'yê Rêzberê (ilonê) de li Batmanê hate kuştin.

6. Mehmet Sîncar (Parlementer): Li Batmanê di 4'ê Rêzberê de hate kuştin, Nizamettin Toğuc jî hate birîndarkirin.



Mehmet Sîncar jî, di 4'ê Rezberê de li Batmanê bi aqûbeta kuştin "kîyâr nedîyar" çû.

Gülmez (Rêveber), M. Salih Aydoğan (Rêveber) û eyî roj li Îzmîrê, ji rêveberen DEP'ê Emîne Turgut, Zîhnî Onay, Asîye Güler, Hamdiye Kurtboğan, Esîn Yamaç hatîn girtin.

Li Wan-Mîksê di 25.12.1993'yan de Serokê DEP'a Mîksê ji aliye komandarê leşkeriyê ve lêdan xwar, ji bo ku ji DEP'ê veqete. Her wiha geflêxwarin li hemû endamê navçeyê jî tê kirin.

Di 25.12.1993'yan de li Enquerê Sînan Zarf (Sekreterê Ruhayê), Eyüp Karakeçeli (Endamê Lijneya Meşandinê ya Navendê) hatîn girtin. Serokê DEP'a Misircê Şemsettin Çiftçi ji tevî çend endamên partiyê di bin cav de ne.

Jİ KÊŞEYÊ RE DU PÎVAN

Di gel vê yekê Komîsyona Dadiyê (edaletê) ya Qanûnê Bengehîn a Meclisê, ji bo mehkemekirina Hatîp Dicle, Leyla Zana, Ahmet Türk û Mahmud Alinak ya ji bo bi idamê, bir-yara rakirina mortalê li pêsiya mehkemekirin hilda. Ev yek ji bo 112 mebûsan dihate xwestin, lê tenê ji bo DEP'vanan bîyîr derket û bîyîr jî wek kîşana bi du pîvanan hate nîxandin.

Serokê belediyan ên ku bi serê xwe bûn û yên ku ji partiyen xwe veqetiyan beşdarî DEP'ê bûn, rik û kîna dewletê kîşandin ser xwe. Niha gelek serokê belediyan Kurd an destê wan ji karêne wan hatîye kîşandin, an hatîne girtin, malen wan hatîne xesirandin. Wek mînak Serokê Belediya Farqînê Fadil Erdede bi hinceta ku alîkariyê bi PKK'ê re kîriye hate girtin.

Ev hemû tiş didin nîşan ku hilbijartîn wê di rewşek serbest û bêmeyl de neyê kirin. Lewre dewlet ji derketina encama ji sandoqen hilbijartînê gelek ditirse û ji iradeya gelê Kurd fikare dike ku xwe bide sandoqê. Ji ber ku qet nebe wê karibe di warê siyasi de qulpeke baş bixe destê xwe. Lî divê xwediye gotina heri dawî jî neyê jîbîrkirin. Çawa ku dibêjin, "Şana baranê ba ye, ya mirinê ta ye" lê li Kurdistanê çebûn û nebûna hilbijartînê jî bi helwesta PKK'ê ve girêdahî ye.

Robert Menard Welat ziyaret kir

Menard li ser pirsên ku me jê kirin, sebebê hatina xwe wiha anî zimên: "Ji berî vê em car caran ji Rexistina Rojnamevanen Bêsinor hin endaman ji bo ku çavdêriyê bikin, dişinin Tirkiyeyê. Vê carê ez bi xwe wek Berpirsiyarê Rêxistinê hatim, ji ber ku rewşa çapemeniyê pirr xerab bûye li Tirkiyeyê û li Kurdistanê. Bi taybeti li Kurdistanê şertên rojnamegeriyê pirr dîjwar in."



Robert Menard

Navenda Nûçeyan- Midûrê Rêxistina Rojnamevanen Bêsinor Robert Menard, rojnameya me ziyaret kir û der heqê rewşa me de agahî standin. Robert Menard bi mebesta agahdarbûna der heqê rojnameya Özgür Gündemê de roja 4'ê Rêbendanê (Çile) ji Parîsê hate Stenbolê û roja pêşî ji berpirsiyarê Gündemê rewşa çapemeniyê guhdarî kir.

Piştî Gündemê, Renard rojnameya me ziyaret kir. Di nav sê rojan de Renard berpirsiyarê rêxistinê rojnamegeriyê û yên Komeleya Mafêni Mirovan ziyaret kir.

Menard li ser pirsên ku me jê kirin, sebebê hatina xwe wiha anî zimên: "Ji berî vê em car caran ji Rexistina Rojnamevanen Bêsinor hin endaman ji bo ku çavdêriyê bikin,

dişinin Tirkiyeyê. Vê carê ez bixwe wek Berpirsiyarê Rêxistinê hatim, ji ber ku rewşa çapemeniyê pirr xerab bûye li Tirkiyeyê û li Kurdistanê. Bi taybeti li Kurdistanê şertên rojnamegeriyê pirr dîjwar in."

Em her tim rewşa rojnamegiriyê taqîp dikan. Erîşen dewletê yên ku di roja Mafêni Mirovan de qewimîn, bûn sebeb ku bi awayekî tundtir em li ser ihlalkirinê mafêni rojnamevanan bisekinin.

Li ser banga Özgür Gündemê ku ji hemû rêxistinê rojnameyên navneteweyî re hatibû şandin, rêxistina me ji civîneke teybîti li dar xist û ez şandim Tirkiyeyê. Emê li Gündemê xwedî derkivin."

Robert Menard piştî du rojan berî ku li Stenbolê hereket bike, bi kurtî ev çavderiyê

xwe ji me re anîn zimên. "Neheqiya ku li Özgür Gündemê tê kirin li ser rûyê dinayayê li tu rojnameyê nebûye. Bi awayekî divê em rê li van neheqî, işkence û hovîtiyan bigirin. Di sedsala 20. de li Stenbolê li rojnamevanan işkence tê kirin. Ev tiştekî sosret e û nikare bê tarîkirin.

Tirkîye bi vî awayî nikare gav bavêje nav Civata Ewrûpayê. Tişte sosret dîqewimin li Tirkiyeyê. Ez cûm ku KMM'ê ziyaret bikim. Dema ez li wir bûm, di nav du saetan de ez nizanim çend kesan telefon kîrin û gotin ku zarokên wan di eyîn rojê de winda bûne. Her deh deqîqeyan mirovok winda dibe. Vî tişti ez şaş hishtim. Tê wê wateyê ku dewleta Tirk li welatiyê xwe xwedî demakeve."

Şerê YNK'ê û Tevgera İslâmî nasekine

Navenda Nûçeyan- Şerê di navbera Yekîti û Tevgera İslâmî de bi çekdârîna Tevgera İslâmî kuta bû. Ew şer bû sedema kuştin û birîndarbûna 200 kesan. Di encama şer de, çekdarîn Yekîtiyê dest dane ser hemû wargehîn Tevgera İslâmî li Hewlîr, Silêmanî û bajarê din. Her wiha Şêx Osman Ebûdûlezîz Serokê Tevgera İslâmî, bi dîlîti kete destê şervanen YNK'ê û niha di bin çav de ye li Masif Selahadînê û mîvanê "Opozisyonâ Iraqî ye".

Di van rojan de Tevgera İslâmî li Londonê agahî da ku çekdarîn tevgerê dest dane ser zincîra (cola) Çiyyayê Ehmed Awa, her wiha got ku, gundê Belxê, Ehmed Awa, Biyara û Tewêle di bin destê şervanen Tevgera İslâmî de ne. Li gorî agahiyê Tevgera İslâmî 15 şervanen YNK'ê hatine kuştin û 25 şervan ji birîndar in. Lî



Di lihevristina navbera hêzên YNK û Tevgera İslâmî de çekên giran ji pirr hatin bikaranî

YNK'ê ev agahî nepejirand û Tevgera İslâmî derewkar derxist û got: "Tenê ev tiş heye, reviyayê Tevgera İslâmî bi tevî pastarên Iranê ji sînorên Iranê derbas dibin û li gundêna başûre Kurdistanê êrîşan tînin pê."

Li Selahadînê di bin Serokatiya Mesut Berzanî de, partiyen YNK û PDK li hev civiyan. Li ser vê bûyerê ku li hînek rê û çareserîyan bi

gerin. Lî Telabanî nikaribû besdarî civînê bibe, lewre 2 heftê ye li derveyî Kurdistanê ye.

Doktor Berhem Salih endamê Serokatiya YNK'ê li Washingtonê agahî da û got ku YNK naxwaze ku Tevgera İslâmî ji holê rabe, lê dixwaze ew tevger li ser qanûnê hikûmeta Kurdistanê bimeşe û li derveyî artêsa Kurdistanê tu hêzên çekdar nemînin.

Ji dewletê amadekariya operasyoneke mezin

Li ser daxwaza Serleskeriya Tirk Lijneya Weziran ji bo sê mehan teskeruya leşker û serbazan da sekinandin. Sebebê dirêjkirina dema leşkeriyê wek ku li hemberî têkoşîna bi gerîlayen ARGK'ê re dewlet neke tengasiyê hate şirovekirin û hate nîrxandin ku dewleta Tirk di amadekiranâ operasyoneke fireh de ye. Li gorî ku tê daxuyandin ji deh salan bi vir ve, ev amadekariya ya herî mîzin e û cebilkane ji misewa dikişin Kurdistanê.

Li gorî ku hate hînbûn di vê hefteyê de meseleya bi paş ve avetina tezkereyan hatiye rojeva civîna Serokleskeriya Tirkîye û Çillerê. Li ser peşniyara leşkeriyê daxwaz hatiye qebûlkirin.

Ji aliye din ve tê diyarkirin ku nêzîkbûna dema hilbijartînê ji bo belediyan ji kiriye ku hikûmet bîrareke wiha bistine.

Leşker û serbazân ku wê ji vê bîrareke ji bo sê mehan sekinandina tezkereyan lê kar bike dewreyen wan ev in: 1972/4 1973/1 1973/3, 1973/3 leşker serbazân yêdeki û demêne tevlihev yên dêrîn 231, 232, 234 û dêrîn 235 a leşkeren ku giredayî xizmeta şeş mehanin.

Le Kurdistanî Başûr

Kongrey nîştimanî Iraqî ke pêk hatwe le layene cor be corekanî oposiziyonî Iraqî raygeyand:

Pêşwazi le serkerdey rêxistinê Kurdi kird ke ser be Irane, diway evey le encamî rûberûbûneweyekî yek hefteyîda legel Y.N.K da çekîyan dana- Emîndarı Kongrey nîştimanî Iraqî Ahmed Çelebi raygeyand: ke Osman Ebdû eziżî Serokî Bizûtnewey İslâmî geystote baregay kongrey nîştimanî Iraq le Selaheddîn û kongre bîrareke dawe ke mîwan bêt heta barî Bizûtnewey İslâmî rûndebêtewê, herweha ew rûberû bûneweyey ke le nîwan Bizûtnewey İslâmî û Y.N.K da rûyda bû, bwe hoy kûjîranî ziyyatir le 72 mîrovî be çek dananî Bizûtnewey İslâmî kotay be şerekân hat.

Şayanî base ke Kurdistanî Iraq le salê 1991 ew P.D.K û Y.N.K be Haw beişî fermanreway deken.. We aşkiraye ke herdû layenî P.D.K û İslâmî ser be kongrey nîştimanî Iraqî ke hewlî rûxanidîn rîjêmî Seddam Hüseyîn deden.

Rojnamey El- Şeriq-Elewset

Ajanê İranê serokekî Kurdên İranê kuş

Roja 4'ê Rêbendanê ajanê SAVAMA'ya İranê Endameki PDK ya İranê (Reberiya Şoreşger) bi navê Taha Kîrmenc, li Çorumê kuş. Ev bûyer bi daxuyaneke Civata Penaberên İranî, derket holê û ev agahî ji aliye Komisyonâ Biliñ ya Penaberan ya Neteweyen Yekbûyî (KBPNY) ve ji hate tesdiqkirin.

Ew bûyer dûmâhîka kujyariyên ajanê İranê ye ku, demeke dirêj e li ser, penaberên İranî, bi taybîji û welatparêzen Kurd pêk tîne. Civata penaber bi destê reşekujen İranê hatine kuştin. Sekreterê Civatê Baharê daxuyandî ku, giş mirovîn qetilkirî endamîn PDK'ya İranê Reberiya Şoreşgerî ne. Taha Kîrmenc wek serokekî vê rêxistinê tê naskirin.

Pest û pêkutiya li ser penaberên İranî, bi peymana İran û Tirkîye, ya di der heqê "terorê" de gurrir bû. Muhammed Qadîrî û Bahrem Azersen berî Kîrmenc hatin qetilkirin.

Kanalâ Inter Starê 5 rojan hate sekinandin



Weşana kanala Inter Star, 5 roj hate sekinandin. Ji aliye kanala Inter Starê ve, di 5'ê Rêbendanê (Çile) de li hemberî qanûnê qedexekirina hilbijartînê program hate weşandin. Ev qedexeya hilbijartînê, ji ber ku di

27'ê de, hilbijartina herêmî wê çêbe, li ser wê yekê hatiye derxistin.

Di nav vî qanûnê qedexeyen hilbijartînê de gerek e di televizyonan de propagandaya partîyan neyê kirin. Lî di 5'ê Rêbendanê de kanala Inter Star li hemberî vî qanûnî derket û programek li ser partîyan weşand. Ji ber vê yekê ji, Serokî Lijneya Bilind ya Hilbijartînê, qerara xwe ya 5 rojan sekinandina weşana Inter Starê, bi civîneke çapemeniyê daxuyand.

Piştî daxuyandina vê qerarê, kanala Inter Star weşana xwe bi navê Tele On'ê dewam kir û Koordinatörê Giştî ya Inter Starê Özcan Ertuna bi daxuyaniyek agahî da çapameniyê: "Qerar hîna nehatibû teblixîkirin, ekîbek ji Walîtiya Stenbolê bi darê zorê ketin tesîsa me. Emê vê qerarê Lijneya Bilind ya Hilbijartînê wergerînîn gelek ziman û emê rayeke giştî ya navneteweyî ava bikin. Ev bûyer wê weke gemariyekî bikeve dirokê. Emê li hember pest û pêkutiyan ku li ser çapemeniyê hene, têkoşîna xwe bidominîn."

Ji aliye din ve Inter Star di weşana xwe ya 6'ê Rêbendanê de, gazî gel kir û li ser vê yekê nêzîkî 2 hezar kes li ber tesîsa Inter Starê civiyan û dirûşmeyen, "Hikûmet istifa, Azadî ji çapemeniyê re" avetin.

Cureyek wêjeya devkî di civatêñ gundan de Pêkenîn û pêkenokêñ me

Gabar Çiyan

Em weke netewe ji aliyê pêkenok an jî pêkenînan ve pirr dewlernend in. Pirr millet ji vî aliyî ve deyndarê me ne. Her pêkenîneke me, mesajeke bi dizî an jî vekirî bi xwe re tîne. Ev mesaj, pişti serpêhatiyen bi cure cure û demeke dirêj xwe gihandine roja me. Di nav wan de şopêñ dirokî, cografik xwe dide xuyakirin. Ji awira kenînan ve dewlemendbûna zimanê me jî di wan de tê xuyan. Her wiha ew beşek ji kultur, literatur û folklo-ra me ye.

Jİ DİNAN DÎNTIR

Dibêjin kesen ku sedem tune be û dîsa nekenin dibe ku dîn bin. Gava mirov diçê nava dînan jî, mirov dinêre ku kesê herî bi kîf û yên ku pirr dikenin, ew in. Tê wê wateyê ku kesê nekene ji dînan jî xerabtir e û civata dînan jî, wan qebûli nav xwe nake.

Ken motora moralê ye, lewma ku di demêñ berê de gava şerê mezin çedibûn, li nik xwe jî qesmeren xwe dibirin û berî şer moral dida wan. İro jî ken bi serê xwe ilmek e. Komedî, beşek ji şanoyê ye, sînema, radyo û hwd. e.

Qesmer bûne artîst û bûne xwedî qedr, qîmet. Berê jî, bi qedr û qîmet bûn. Li mala qral bûn û xwarina xweş wan dix-war, cilê xweşik para wan diket, bi qral re diçûn deverêñ dûr û digerîyan. Firqa di neqeba doh û iro de, teknîk û modernîzasyon e. Wekî din nav guhertin e.

Naşeroka çirokêñ wan an jî pêkenokêñ wan, hinekî din li ser hate şixulandin, doh piyes bû, iro bû senaryo.

CUREYÊN KENÊ

Em dixwazin hinek li ser kenan bisekinin. Bi baweriya min, ken heye û kenok heye. Her du jî ew tişt e ku, li hember nêrîn, guhdarkirin an jî dîtina tiştekî ye ku, wê keliyê xwe di mirovan de dide xuyanîkirinê. Ev dikare ken be û dikare girîn jî be.

Hinek hene gava dikenin weke gamêşan diqorin û hinek jî hene mîna kewan diwxînin, hinek jî weke ku di hundirê boriyê de ye, deng derdixînin. Bi awayekî din ku mirov bibeje, dengê kenan li gorî mirovan diguhere. Lê kepê mirov rihet dike ew e ku, devê mirov weke maran jî hevûdin vedizile, di kezeba mirov de ba namîne, hêşir jî çavêñ mirov tê avetin, dilê mirov dibure, rihê mirov sist dibe, mirov li erdê dixindire, leq leqe kenê li dû hev bi rêz dibe. Divê ku di wê civatê de kesek mîna mirov nekene, dengê tu kesî bi ser yê mirov nekeve, hemû kes bi kene mirov bikenin, lîkitka mirov û hêşir tevi hevûdin dibe.

Bi taybeti li gundên Kurdistanê her şev li malekî civat he-

*Nuktedanê wisa bi nav û deng hene ku,
ne bi tenê bi henek û yariyêñ xwe
lê bi şeklêñ xwe jî
civatan şen dikin, ji kenan hêstiran
bi çavan dixin.
Li hêla rastê Keremê Kor i Bazidî
ji vî aliyî xwe ve gelek naskirî ye.
Li jêrê jî, mirovekî ramakî heye ku ew jî,
ji wî aliyî ve ne kêm e.*



ye. Di wân şevan de ken cihekî taybeti digire. Carina di gund de li çend deveran civat çedibin. Lî civata herî balkêş û bi kes ew civat e ku tê de kesen zêde hene-kan dike hebin. Kesê navsal ku hene-kan di nava salan de çûbin, bi zarokêñ xwe yî biçûk têñ wê ci-vatê. Ev ji awira ken û kenînê ve bi kultura xwe perwerde dibe, ya diduyan jî ew e ku pê eyba xwe wedişerîn. Ji ber ku gelek kes ji awira qalkirina hene-kan, hene-kan ve jîr in û pispor in. Guhdarkirina van, zikek qalind û dilek rihet dixwaze. Ken li dû hevî têñ. Dengê cewaz cewaz ji odayê derdi-keve û ber bi ezman ve diçê.

Kesen ku di nav salan de çûne, pirr jîr in. Nakevin xefkê. Zarokêñ xwe yî biçûk dixine da-wa xwe. Ji ber kengê ku ken zo-ra wen dibe, carina ba ji ber wan diçê. Gava ba bêdeng be, yên xort ji hev dikevin şikê û hev di-din sondê. Gava ku bi deng be, çav li devera ku deng jê hatiye digere. Helbet yê ku di nav salan de çûne bi carekê re şimaqekî li yê biçûk dixin û şimaqekî din... Heta ku hinek têñ ji nav destê wî derdixînin. Dûre jî yê biçûk dibe gunehkar.

XWEŞIYA CIVATÊN GUNDAN

Bi saetan qise li dû hev têñ, kes nabetile û pêkenînek jî yan din xweştir û bi tamtir tê, dibe nîvê şevê an jî berê sibehê, lê carina hîn jê ew qise û germî berdewam e.

Gelek caran gazî hinekan di-kin ji bo ku were bibe mîvan û hene-kan ji wan re bike. Ev pirr dişibe weke ku mirov li şanoye-ke din binêre ku naşeroka wê guherandî ye. Ev tişt di nava gundên Kurdistanê de dibe. Hîna jî berdewam e.

BI DİNAN RE HENEK

Dema ku ev tişt tune bin disa jî alternatif xelas nabin. Dîn he-ne-kan bi dînan re dikin ku her dînek carina qiseyan di-ke, kesê bi aqil nikarin wî tiştî fi-ki birkin. Dibêjin ku bi her mirovekî hinek dînîşî heye. An jî de-verine wî yên qels hene. Ev peyv ne dûri aqilan e. Bi awaye-ki din hinekî paya xwe yî rastî heye.


Eger em werine ser peyva xwe ku li gundan gava tu kes tu-ne be ku pê hene-kan bikin, di-çin bi dînan re qise dikin. Mirov dikare ji vê sûdan derfîne. Yek jê, ji ber ku li gund tu kes tune ku hene-kan bike, gundi wîtamîna xwe ya hene-kan bi vî awayî distînîn. Aliyê diduwan jî ev e ku her dînek pêwistiya xwe bi der-man û lênerînî heye.

Gava mirov berê mirov dîn bide başiyê, ev bi xwe jî lênerîn e û dermanek e. Ji ber ku ji karê xerab, mirov berê wan di-de hene-kan û her pê re hene-kan dike. Ev tişt weke perwerde û weke derman tiştekî baş e, germayî tê de xuyanî dike. Ji aliyê olî û ji aliyê hisan ve ji Kurd weke millet, hez ji ketiyan dike. Ji ber vê yekê jî dîn, du alî sû-dan werdigrê û dikare zûtir baş-tir bibe an jî bétaluke bibe.

HENEKÊN DOH Û YÊN İRO

İro li gundên Kurdistanê ger-mayiya hene-kan an jî hene-kan heye û mîna berê ye. Li gorî demê, pêkenîn têñ gotin. Di dema çandiniyê de li ser çandiniyê, di dema hilandina zad de li ser hilanînê û li ser bênderê. Di dema ku leşker digirin dora gund, li ser xwe parastinê û le-hengiyê. Di dema zîndaniyê de jî, li ser xwe spartin an jî berxwedanê.

Gelek caran maldarî û çûna ji gund bo bajaran, guhertinan di-be.



kultura mirov de çedike. An jî tesîrê li ser kulturê dike. Li Kur-distânê, ji ber ku bêwelatî heye, her aliyê kultura xwe weke çavêñ xwe diparêzin. Li malan, li meydanan, li qehwexanan, li cihê kar, li mizgeftê, li taxan, li kuçan hene-kan têñ gotin. Henek ji aliyê teknîkî jî bi pêş dixînîn. Dîkin stran, dîkin piyes, dîkin film, dîkin senaryo, dixin programê radyoyê, dîkin helbest, dîkin pirtûk û di kovar û rojnaman de di-nivisînîn. Ev bi xwe, xwedî der-ke-tina kultura xwe ye.

Yanî kapitalizm jî nikare zede hîkariyên xerab li ser kultura Kurdi, li kurdistanê bike. Qelewtir dibe. Ev aliyek ji meselî ye. Aliyê karê fîli heye.

CUREYÊN KENOKAN

Eger em werine ser babeta kenokan, dê em karin yê di du aliyan de, di çav re derbas bikin. Yek jê nîvken e. An jî ne kenek wiha ye ku, dev ji hevudin vezile, dilê mirov bişê û hêşir di çavêñ mirov de biavêjin. Kenok di bin ken re ye. Ew jî ken e; lê mirov têr nake, wîtamîna pêwist nade mirov.

Kenokek din heye ku pirr xe-rab e. Ew hene-kan pê kirin e. An jî dil rehetkirina egoîstî, dil ne paqiji ye. Em Kurd jê re dibêjin kenê di bin simbelan de. Ku ev ken dikare mala mirov xerab bi-ke, mirovan bi saxî binerd bike. Pêkenok li gorî jiyanâ her welat, neteweyekê dikarin ne wek he-vûdin bin, lê kenê di bin simbelan de li her deverî wek hev-in. Gelek caran gava ku mirov hevalê xwe an yekî din bixapîne û di bin çavan de li wî binêre, bikene... Ev kenok nakeve nav kenan. Ne ken e. Neynika nava dilê mirovan e. Kenok dikare berevajiyê vê be jî û ne bi niyete-tek xerab be jî, lê vê carê kesê vê kenê bi xwe dike, nerehet di-be.

KENANDIN HUNER E

Baş e tiştekî din heye. Her em qala kenê dikin. Ma gelo ke-nandina mirovan pirr tehl e? Na! Bi baweriya gelemeperî gava mirovek ne hunermend be nikare kesê din bikenîne. Helbet her kesek li gorî xwe hunermend e. Hinek hene, dixwazin hene-kan bikin û dora xwe bikenînîn. Ew kes pirr zorê didin xwe, lê mixa-bin ku civatê bi xwe re edem di-kin, dikujin.

Hinek hene, tîpêñ wan mirovan dikenîne, ji xwe gava ku qise dikin, zik li mirov dibe weke dengê bilbilan an jî helbesten e-vîniyê.

Hinek jî hene li gorî demê mirovan dikarin bikenînîn.

PISPORIYA HUNERÊ KENANDIN E

Bi rastî di wan salen dawî de her ji bo kenandina mirovan, bi pisporî li cihanê kar tê meşan-din. Gelek nîvîkar ketine tengasiya bidesxistina babetên ke-nînê. Ji bo vê yekê jî welat bi welat digerin û peren mezin di-din heya ku tiştekî baş û bi nirx bi dest dixînîn.

Ji bo ku mirovan bikenînîn bi makayajen cure cure xwe dikine şeklekî din, dike palyaço. Bi rastî, ji ber mecalen ekonomik ku xelkê her roj diperçiqînîn, hal di xelkê de nehiştine ku bikenin. Bi taybeti, di welatê ku dikevin qada "diriyaya sêyemîn" de, ge-lek caran xelkê ken ji bîr kiriye. Ji ber ku dagirkerî heye, ekonomi ne baş e, nakenin. Carina feyde nake. Xelk difikire, dibêje: "Na gava ku mirovan nekene, dê jiyan bibe weke sawarê bêxwê." Ji xwe roja qiyametê ev e. Kesê ku nakenin jî, zebanî bi xwe ne. Divê ku wê demê mirov bigirî ji bo ku ken têk çûye. Kesê ku vê qetliamê çedike İmperyalizm bi xwe ye.

Xebatek li ser şanoya Kurdî (Li başûrê Kurdistanê-5)

Serhildan û şanoya Kurdî

Pismam

Qewimîna serhildana bihara 1991'an li başûrê Kurdistanê, yek ji bûyerên girîng i ku dîroka Kurdî bi şanazi wê di rûpelên xwe de dihewîne ye. Beriya ku em behsa huner û şanoyê di salênotian de bikin, pêwest e ku salox ji rola şanogerên Kurdî di dema serhildanê de bê dayîn, ku şanoger jî di milê gel û pêşmergeyan de rahiştibûn çekan û di amadehiyên çêkirina serhildanê de xwedî kar û bandor (tesîr) bûn. Şanoya Kurdî di vê govendê de çar gulên sor dañîn ser maseya serhildanê, çar şanoger kirin bi gorî Kurd û Kurdistanê. Li bajarê Hewlîrê hunermend **Cewher Bapîr û Newzad Mistefa**, li bajarê Silêmaniyê **Eriwan Omer Dewlet** û li Çemçemalê jî **Semedê Heci Hemîd**. Ev yek jî, ji bo rola welatparêziyê di dîroka şanoya Kurdî de şahidekî mezin e. Hewce ye ku bê gotin, di dema raperînê de şanogeran lîstik pêşkêş dikirin û bi xebatê xwe ve tevî serhildanê bûn.

PIŞTÎ RAPERİNÊ

Di pey raperîna bihara 91'an de jî şanoyê gavêx xwe yên asayı (normal) bêrepêş diavêt, gel jî dîsa wekî berê bi dilekî germ bi leqayî wan ve dicû. Delîlê vê yekê jî ev e ku berhemên şanogeriyê Silêmaniyê bêhtir dêhna şanohezan kişândiye. Mînak: **Galiyogolla**; derhînana **Hadi Elmahdi, Mesîh**; derhînana **Bekir Reşîd, Simkolanîy Espeşê** (Pêkoliya Hespê Çê), derhînana **Dilşad Ehmed**. Her wiha derketina kovara **Ezmûn** ku cara pêşin e ji bo hunerê şanoyê li başûrê welêt hatibû weşandin; ji aliye **Koma Şanoya Azmûngerên Kurd** ve.

Lê ew rîveçünên asayı zêde nedomîyan û şancya Kurdî hêdî hêdî gav sist kirin û ew germ û gurî nema. Bi vê rewşa hanê re, gel jî li dor şanoyê kêm bû. Belgeya mezin jî, ji bo vê yekê herdu festivalen **Bîranîna Helepçeyê** yên 92-93'ê ne ku, şanoyê bi tenê rola xwe ya berbiçav nedît, wezîfeya xwe jî di herdu festivalen dawîn de pêk neanî. Ku ji şanogerên Kurd ev tiş qet nedihate hêvikirin. Di gelek axaftinê nav hunermendan de dihate gotin ki dema Kurdistan azad bibe wê şanoya Kurdî bêrepêş here û



Hunermend Gezîze di listika bi navê sirûdêkî xoşewistî de

ENCAM

Di gel van tiştan em bawer in ku bi awayeke ciddî û dilsozî dest lê bê gerîn, dikare şanoya Kurdî bê rizgarkirin.

Gel, her ew gel e û şanohêzê wan gavan e. Şanoger jî dîsa her ew e ku berê, di bin zilma rejîma BAAS'ê de xebatê xwe dimeşand. Tê xuyan ku ji nû ve vejandina şanoya Kurdî erka (wezîfeya) Hikûmeta Federal a Kurdistanê û Wezîriya Çandê û hemû partiyen siyasiye. Heke ew alîkariyê bi her awayî bêyi meyl û cihêtiyê bi hunermendan şanoyê re bikin, ku ew jî bi serê xwe bibin û ne di bin tesîra siyaseta partîyan de bibin, wê şanoya Kurdî qet nebe piçek bi ser xwe ve we're.

Em bawer dikin, heke sebebên wê nexwesinê bêne dîtin, hunermendan fêdekar pirr in, ne ku şanoya Kurdî rizgar bikin dibe ku gavê mezin jî pê biavêjin.

Perawêz

* Berê û ji sala 1970'yan ta niha jî besa Kurdî li TV'ya Kerkûkê heye. Lê eşkere ye ku wek TV'ya Kurdistanê nayê qebûlkirin.

** Bi pirranî ew berhemên ku ji bo TV'ye hatine çekirin ên sade û basit in.

Wergera

**ji Kurmanciya jérîn
Pisman û Zana Farqînî**

FESTİVALÊ AMOJGEHÊ

Amojgeha (enstituya) Hunerên Bedew li Silêmaniyê, her sal festivala şanoya Kurdî çêdiye, lê bi awayekî ji berê qelstir û bîner û hunermend jî li gorî demêñ berê kêmter besdarî wê dibin. Festivala 1993' yan tardeyekê berhemên baş jî bi xwe re anî, lê ew berhem bûn sebebên munâqşeyen germ û bi hêrs. Lewre hin ciwanên nû dixwazin bi cureyeke hunerê nû kar bikin, ku ji a-liyê şêweyê (terzê) ve dewlemed e, lê ji hêla naveroka xwe ve, ji jan û êşa gelê Kurd dûr e û xizmeta vê qonaxê nake.

SEBEBÊ DAKETINÊ

Ji me ve diyar e ku sebeb zehf in, bi pirranî jî, ji rewşa ya gel ya aborî û debarê

pişti serhildanê bi şûn ve. Lê bi baweriya me sebebên herî mezin ên daketina şanoya Kurdî ev in:

1. Çebûna televizyonê Kurdî û weşankirina wan i li hemû bajaren Başûr. Ev jî carra yekemîn e ku Kurd dibin xwediyê televizyonê.

2. Gelek hunermendan şanoyê dest avêtin berhemên ji bo televizyonê. Ev rewş jî dide diyarkirin ku şano ji vê yekê bi zirar derketiye.

3. Di dema "Azadî û Serhildanê" de şasbûna hunermend bi rewşa xwe û pirrani-

kesen di rolên qesmeran de li bajarê Hewlîrê dileyîzin...

TEMENEKÎ HEFTÊ SALÎ

Şanoya Kurdî iro temenê wê heftê sal e û heta zêdetir e jî. Gelek azmûnen mezin di xwe de ditine. Lê di gel wan hemû azmûneyan em nikarin bibêjin bes e û em xwediyê şanoyeke resen in. Kî ji me re dikare bersiva vê pirsê bide? A niha şanoya me ya Kurdî heye an na? Ez bi xwe nikarim pirsê bîbersivînim. Li ser vê yekê jî kêmasya herî mezin di şanoya me de ew e ku deqêñ serketi ji hejmara tiliyên dest nabihurin. Nexwe hîn rîyeke dirêj û dijwar li pêsiya me ye. Li ber çav e, ez nabêjim şanoya Kurdî tîştek nekiriye û bêkelepor (mîrat) e. Na, bi şanazî ez salo-xa azmûneyen

şanoyê didim. Lê rizgarkirina şanoyê ji vê rewşê, barê ser milê hemûyan e û divê xeman bixwin jî. Pirsa tevan jî ev e: Ji bo şano ji vê rewşê bifilitê divê ci bê kirin?

Heta niha vê pirsê bersiva xwe neditiye.

Rêxistina ku bingehê Komara Mehabadê danî: Komeleyî Jiyaweyî Kurd

M. Devran

Komel û rêxistinê partîyên siyasi û yên çandî, di rojhilatê welêt de pîr bi derengî hatin damezirandin, kar û xebat lê hatin kirin. Di destpêka Sherê Cihanê yê Yekemîn de, bi saya **A. Rezaq Bedirxan**; bi alîkariya **Simko** û hinek xanedanê Kurdistan li devera **Xoyê** (Makoyê) fikra xebata rêxistinî di bîran de hate vejandin. Lê belê pîr bi rê ve neçû û ev berhem û bermayı li paş xwe nehişt.

Dîsa di vê demê de vê carê **Seyid Taha Şemzînî** bi alîkariya Simko û hinek kesen weltparêz ve komeleyek li **Wirmîyê** bi navê **İstixlasa Kurdistanê** damezirandin. Temenê wê jî zehf dirêj nebû û têk çû.

Sebebê ku kar û barêni bi vî rengî zêde bi rê ve neçûn û temeneke dircj nedomandin ev e ku, nikaribûne xwe ji kontrola hikûmeta navendi ya **Riza Şah** berê zîlm û zora xwe dabû ser xelkê Kurd; bi taybeti jî ser xanedanê Kurd ên ku li ser doza Kurdiyyê dixebeitin. Wek **Mehmûd Xanê Dizili, Mehmûd Xanê Kanî Sanan** li Merwanê, Çavreşan li Hewramê, Mele Xelîl li Serdeşte tevdîren xwe dikirin. Ji bo serhildaneke çekdarî.

Xebata wan xanedanen jî neçû serî, bi awayekî ne mirovi hatin pelçigandin. Hin ji wan hatin kuştin, yên din jî di hebs û zîndanê Tehranê de mirin. Xelkê ku bi wan re bûn, koçî çolêن Tehranê kirin. Pişti vê bûyerê Kurdistan ket bin qamçî û darên polis û leşkeren Riza Şahê Iranê.

Di sala 1927'an de li Lubnanê **Komeleya Xoybûnê** hate avakirin û hêvî û armanca wê ew bû ku liqen (şaxen) xwe li hundir û derveyî Kurdistanê veke, têkili li der û hundir deyne û kar û barê xwe biajo.

Di vê navê de, ji malbata Qaziyan kesek li Tirkîyeyê bû û behsa avakirina komeleyê li rojhilatê Kurdistanê belav kir. Di nav Kurdên **Sablaxê** de fikra Kurdiyyê vejand. Lî paşê cih û war lê kêm û teng bû.

Di serê salên Çili de bi navê **Azadixweyî Kurdistanê**, partiyek hate avakirin. Berhema wê jî bi tenê beyanek bû, ku bixêrhatiniya leşkeren sor ên Sovyetî dikir. Di dema dagirkirina Kurdistanê de.

Di wan demen zehmet û dijwar de **Komeleyî Jiyaweyî Kurd (J.K.)** damezirî:

Di dema ku Cenga Cihanê ya Duyemîn dest pê kir, Riza Şah berê xwe da ber bi Almanyaya Nazî ve û nêzikahî tê da ku Iranê bike meydana casûs û ravêjk-

erên Almanyaya Hitler. Pişti havîna 1941'î ku Almanya êrîş bir ser Sovyetê, cepheyeke mezin û fireh di nav DYA (USA), Sovyet û Ingiliz de li dijî Almanya, İtalya û Japonyayê çebû.

Di 25'ê Rezberê (ilon) de ji alyî bakur ve leşkeren sor ên Sovyetê, ji alyî başûr ve yên DYA û Ingiliz ketin nav axa Iranê. Iran ji alyî wan ve hate dagirkirin û rejîma Riza Şah ku piştgirî ji Almanyayê distand rûxiya.

Pişti ku bakur kete bindestê Sovyetê û başûr jî ket yê Ingilîzan, hinek hawayeke azad peyde bû û rêxistinê siyasi hatin sazkinin. Lî bi tenê devera **Mehabadê**, ji bin destê Sovyet û Amerika û Ingilizler azad bû; lê J.K hatibû damezirandin. Li gorî ku **Dr. A. Qasimlo** agahdarî dide me, di avakirina Komeleyî Jiyaweyî Kurd (J.K) de van kesan cih standine: **Huseyn Firuher, Rehman Zebîhî (Sekreterê wê yê giştî), A. Rahman Îmami, A. Qadir Muderîsi, Necmedîn Tewhidî, Mihemed Nanewazade, Ali Mahmûdî, Mihemed Eshabî, A. Rahman Kîyanî, Sediqê Heyderî, Qasimê Qadirî**.

Mele Qadirê Muderîsi jî ku yek ji damezrenêrên J.K'ê ye,



Nexşeya Komara Mehabadê ku 1946'an de ava bûbû.

da. Dihate cem sê kesan û li ber çavên wan heft caran bi Quranê ji bo van şes xalêن jérîn sond dixwar:

1. Xiyanet û xinizi divê bi netewaya Kurd neyê kirin

2. Divê têkoşînê ji bo otonomiya Kurdan bike

3. Divê rêzikeke rêxistinê, ne bi ziman, ne bi qelem û ne jî bi işaretê neyê eşkerekirin

4. Ta dawiya temenê (emrê) xwe endam bimîne

5. Divê jin û merên Kurdan hemûyan ji xwe re wek xwiş û bira bizanibe

6. Bêyi ferma J.K'ê divê nebe endamê tu rêxistin û komên din.

Komikên xebatê ji sê kesan pêk dihat. Bi tenê sê endaman



Hin rîveberên Komara Kurdî a Mehabadê, di bihara 1947'an de, di girtigehê ku tê de bûn de.

van navan destnisan dike: **Mihemed Nanewazade, Rehman Zebîhî, Huseyn Firuher, A. Rahman Îmami, Mihemed Yaho, A. Qadir Muderîsi, Sediqê Heydirî, Mir Hac**.

Li ser gotina Mele Qadir, Huseyn Firuher du salan serokatiya komeleyê kiriye û navê **Ahmed Ilmi, Ezîz Zindi, M. Emin Şerifi** jî di listeyâ sisêyan de derbas dike.

Mela Qadirê Muderîsi li ser mercen endambûna komeleyê wiha dibêje:


– Dema kesek dibû endamê komeleya J.K'ê, pêşiyê diçû xwe pak dikir, xwe bi dîn ve girê di-

hevûdin nas dikirin. Komele, rêxistinê siyasi û qedexe bû, lewre bi nehêni (veşarî) karê xwe dikir

ARMANCÊN JK'ê

Di hejmara yekemîn de, **Kovara Niştiman** de bi navê "Armanciy ême" hedefen wê wiha hatiye nivisin:

– Ey birayê Kurd, yê xoşewîst! Komeleya J.K'ê ji bo yekiti û yekgirtinê têdikoşe. Wek dijîminiya xwe bi xwe, derebegî, xwearî, polperestî, dostaniya bi biyaniyan re ku dikeve pêşîya serketin û pêşî li pêşketina Kurdistan digire, bi hemû hêz û qewetan bi wan re têdikoşe. Zin-



Ev her sê serokên Kurd di 31'ê Adara 1947'an de hatibûn daleqandin: Muhammed Huseyîn Seyîfi Qadi, Qadi Muhammed, Abdulqasim Sadîfi Qadi

DAXWAZNAMEYA J.K'Ê

– Divê ji alyî hikûmeta Iranê ve bê qebûkirin ku, zimanê Kurdi li hemû deveren Kurdistanê bibe zimanekî fermî (resmi). Hejmarâ Kurdan ji sê milyonan zedetir e.

– Zimanê Kurdi li Kurdistanê bibe zimanê xwendin, hikûmet û mehkemeyan

– Karmendên ku li Kurdistanê kar dikin, divê hemû Kurd bin

– Baca ku ji Kurdistanê tê komkirin ji bo pêşxistina Kurdistan, avakirina nexweşxane û dibistanan bê bikaranîn.

– Ev daxwazname divê ku li meclisa Iranê jê bê behskirin û bîryarek li serê bê dayîn ku Kurd pê dilxweş bibin

– Ev daxwazên me yên vê gavê ne. J.K'ê baweriya wê ya temamî heye ku dema Cenga Cihanê ya Duyemîn biqede wê mafênen xwe yên çarenûsiyê bistîne. Ev maf xwezayî ne, ji bo hemû netewayan. Pêwist e ku pişti qedîna şer munaqşe li ser vê meseleyê bête kirin û bê guman Kurd mafê xwe yê çarenasîyê dikarin bistinîn.

– Komele vê yañnameyê bi awayekî resmî belav dike, tê de çarenûsa netewaya Kurd û mafê tayînkirina pêşerojê heye.

Di nav zemanê bêhñfireh de li ser Kurdên Rojhilatê xebat û lebateke wer fireh a rewşenbirîya Kurdi nedihate kirin. Riza Şahê sîtemkar wisa li gelê Kurd kiribû ku xwe ji bîr bikin. Dixwest ku netewaya Kurd di nav gelê Iranê de bihelîne. Lî belê tu car neteweyen mezin bêxwedî namînin.

Kovara Niştiman: Di meha Gulana 1943' yan de Komeleya J.K'ê nêzikî sed endamî li Baxê xudaperist li hev kom bûn û bîryara derxistina kovarêke dan. Nivîskarê vê kovarê bi pîranî jî şairê Kurd pêk dihat. Hinek ji wan ev in:

Rehman Zebîhî (Bêjrn), A. Rahman Şerefkendî (Hejar), Mihemed Emin Şexul Islam (Hêmin)

Çavkanî: Hikûmetiy Kurdistan; Nêwsîrwan, Mistefa Emîn û hwd.

XWENÇE

Berhemek li ser zargotina Kurdi

■ Zeynelabidin Zinar ku li Swêdê dijî, bi xebatê xwe yên li ser berhevkirina zargotina Kurdi û yên li ser wergerandina berhemên me yên kevin ji tipêni Erebi ji bo yên Latinî, tê naskirin. Di destê me de pirtûka wî ya bi navê "Xwençe" cilda VI. heye. Tê de klam, serpêhatî, meselok, çirok cih distînin.

Zana Farqînî

Girîngiya xebata li ser berhevkirina folklorê, bêguman û gengeşî rastiyek e ku ji aliyê her kesî ve tê qebulkirinê. A din jî edebiyata nivîskî ji vê kaniyê xwe xwedî dike, jê têr dibe. Bi gotineke din bingeh e jê re.

Nexwe ji bo me Kurdan ku ziman hatiye qedexekirin, zargotin nehatiye komkirin û fîkirkirina bi Kurdi hîn baş nehatiye pê û di rewşa ku em nikarin xewnê xwe bi Kurdi bibînin de, pêwistîya xebata li ser wê, hîn bêhtir xwe dide fêmkirinê.

Zeynelabidin Zinar ku li Swêdê dijî, bi xebatê xwe yên li ser berhevkirina zargotina Kurdi û yên li ser wergerandina berhemên me yên kevin ji tipêni Erebi ji bo yên Latinî, tê naskirin. Di destê me de pirtûka wî ya bi navê "Xwençe" cilda VI. heye. Tê de klam, serpêhatî, meselok, çirok cih distînin.

Gava min ev berhem xwend, hem ez keniyam, hem fikrim û hem jî xembar bûm. Keniyam, ji ber ku tiştîne pêkenî û ecêp tê de hebûn. Fikrim, lewma serpêhatî û bûyerên ku qewimîne wisa hatine teswîkirin û honandin ji aliyê gel ve, ku mirov ji xwe

re şas dimîne. Xembar bûm ji ber ku bi wan hatiye listin. Anglo dema hatine berhevkirin dest li zimên geriyaye. Wek di çirok an ji çîrvanoka bi navê "Mîr Mehmûd" ku di de diyarkirin ji devê çirokbêj Tewfîq Begê neviyê Fetah Begê Xerzan hatiye girtin û temenê wî 67 sal e, di beşa "Baba Ehmed û Sîltan Wehdedîn" de peyvîn "rojname", "tofek" ku di şûna "bîlûk" a Tîrkî de hatiye bikaranîn, "pêşniyar" û hwd. hene. Min bi tenê ji wê beşê mînak da. Di yên din de jî teví berhevkiyîn din ev yek heye. Ew peyv lê hatine zêdekrin.

Bi ya min ev şâsiyek e û hewce ye neyê kirin. Mînak di "Stranê Têkil" de ku ji devê Şakirê Müşî û Kazim ên dengbêj standiye, dest nedaye zarê wan. Di wê de qenc kiriye û wek metodeke zanistî liviyaye. Diviya ku ji bo yên din jî vê hesasiyetê nîşan bida.

Xebatê li ser berhevkirina zargotinê divê ku bêyi destlêdan bê civandin. Ji ber ku kesen li ser wan xebatê analîzî -di her warî de, wek kesen ku li dû peyvan bigere- dike, karibe encameke zanistî jê bi dest bixîne.

Bi saya berhemên ku bi alîkariya kesen zanyar û çand-

Zeynelabidin Zinar

XWENÇE

CILD VI
Kitam, Serpêhatî, Meselok û Çirok

PENCİNAR
Weşanxaneya Çanda Kurdi
Stockholm 1993

hez hatine afirandin ên li ser zargotinê, em dikarin baş zimanê xwe bi kar bînin, pê bifikirin, bûyeran teswîr bikin, bîhonin û vebêjin bi giyanek zimanê Kurdi.

Ev yek jî bi xebatê pê ewle mimkûn e. Zeynelabidin Zinar bi xebatê xwe geşiyekê tîne ji vî warî re û dibe alîkar ji nivîskar, wêjevan, hunermend û kesen ku bixwaze bi Kurdiyeke xwerû bipeyive, bifikire û hwd re. Lewma hewce ye ku haya wî ji van yekan ji hebe.

Pirtûka ku ji aliyê Zeynelabidin Zinar ve hatiye amadekirin ji 266 rûpelên kaxezên spî yên bi kalite pêk tê û ji aliyê Pencînar "Weşanxaneya Çanda Kurdi" ve di 1993 yan de hatiye weşandin.

Navnîşana Xwestinê

Pencînar Kurdiska Kulturforlaget
Weşanxaneya Çanda Kurdi
Box: 3088
161 03 Bromma / Stockholm / Sweden

Heval Ararat

QULING HATIN...

Quling hatin, quling hatin welatê Serhedê
Bi xwe re anîn bêhna gulan
Bibîhîzin ci tê dengê birîna dilan
Îrbetan dixwazin herin welatê Serhedê, Geliyê Zilan
Kel tîjî bû, girî vebûn, hêşirên Remo
neseñin bi desmalan

Niha derbihar e
Dayîka pîr nan davê ser sîlê, sor dike
Bizinek dikale li hember
Temoyê law Qotê nan û toraq daniye pêşîya xwe
Pê mijûliya xwe dike

Dayîka pîr rabe!
Temoyê law rabe!
Quling hatin, quling hatin
Renkayî ye, renkayî ye
Şoreşger hatin, şoreşger hatin
Renkayî ye, renkayî ye, renkayî ye.

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Parîs û Kurdistan

Belkî jî xwendevanê Welata hêja dema ku vê sernivîsê bibînin, bibêjin: "Gelo ci munasebet di navbera Parîs û Kurdistanê de heye ku bi hev re hatine nivîsandin?" Lî belê piştî ku hemû bête xwendin, dê rind bê fêmkirin û zanîn ka bi ci rewşê wek hev in.

Ev cara sisêyan e ku ez Parîsê ziyaret dikim. Par, berî du mehan û berî mehekê. Her sê caran ji Parîs û Kurdistan di hiş û xeyala min de, bi hev re, bi cih bûn û bi rewşekê hatin xuyakirin. Par, beriya her tiştî, li Parîsê girojên Cezayîrê (Çaşîk û xayînên Ereban ku di şoreşa Cezayîrê de heval û alîkarân dijmin û li dijî Cezayîrê bûn.) bala min pîr kişandin. Ez pîr pîr li wan fîkirîm û heyirîm. Bi rastî ku min di sikakên Parîsê de ew perîşanî, rezîlî û bêşerefiya wan dît, ez kûr kûr fîkirîm. Kurdistan û caşîk, xayîn û hevkarân dijmin weke perdeya sînemayê di ber çavê min, di hiş û xeyalîn min re derbas bûn.

Min dît ku piştî azadiya Kurdistanê ew jî wek giroyen Cezayîrê yê xayîn û bêşeref di sikakên Enquerê, Bexda, Şam û Tehranê de rezîl, riswa, perîşan û kuçelanî bûne û dihewitin, xîret û namûsa xwe difiroşin, lê bi yek ferqeke pîr gi-ring ku ew jî ev e: Keç û

bûk û jînên Kurd, namûsa xwe nafiroşin. Tufê rûyêna caşîk û xayînên xwe dikin.

Di çûna xwe ya berî du mehan de jî min dît ku, Parîs weke deryayake bêpayan e. Agir, pêt û ronahiya xemla sersala nû, pêl û lem didin. Wekî ala azadî û serfiraziya Kurdistanê, di nav pêt û lav û agir de ye. Lî ronahi, lav, pêt, agirê Parîsê yê cejn û sersala azadî, demokrasî, kêfxweşî û şadiyê ye. Agir, şewat, pêt û alavên Kurdistanê jî yê zilm, zor, bêdadî û hovîtiya dijmin û yê top, teyare û bombevê hov û barbaran in.

Belê pêta Parîs û Kurdistanê ronahi daye cihanê. Pêta Parîsê ya cejn û şadiyê ye, ya Kurdistanê ya ceng û şer û bêdadîye ye. Çawa ku Napolyonê Parîsê, dema dest avete ceng û şoreşa azadî û demokrasiyê, faşîst û barbarê Parîsê jê re digotin, "Cinawîre Korsîka û eşqiya" lê piştî ku Parîs azad kir û muzafer bû, jê re gotin şoreşger, serok, rîhber û ewliya. Parîs jî di şuna zilm û bêdadîye de bi pêt û agirê cejna azadiyê rohî bû û xemili.

Dê ew dem were ku şoreşa Kurdistanê jî bi ser keve û serok, rîhber û şoreşgerên wê şoreşa pîroz jî bibin Napolyon û serokên azadiyê û ewliyayê Kurdistanê. Bila tu suphe û teredûta tu kesî di vê rastiyê de tune be. Nişanên vê mizgîna pîroz di Parîsê de, di hemû Ewrûpayê de, di Rûsyayê de, di cihanê de, xuya bûne. Rohnahiya doza Kurd û Kurdistanê daye hemû cihanê, ji ber vê ye jî ku dijmin dîn û har bûye, ji mirovahîyê jî bêpar bûye.

Otonomî di zikê serxwebûnê de xwînrijandin e!

- Di dîroka Kurdistanê de otonomiyê pirr tawanên (sûc) mezin bi xwe re anîne. Ev bû sedem ku Kurd hîn di sedsalên 15-18'an de di hişyarbûna neteweyî bi derengiyê bikevin û li dijî Sefewiyan alikariya Osmaniyan bikin, bi vî awayî jî Kurdistan parce bibe.
- Di dema damezirîna dewleta Tirk de dîsa fikra otonomiyê bû ku rî ber xebatêni ji bo Kurdistanê serbixwe girt û tevgera neteweyî parce kir. Di dema Peymana Sevrê de dîsa otonomî ji aliyê dewletêni serketî ve ji bo rîbirrîna hişyarbûna hestêni neteweyî hate bikaranîn. Dîsa di vî warî de Komara Mehabadê nimûneyeke pirr xuya û diyar e.

Memoyê Dekşûrî

Otonomî, gerandina (îdarekirin) navçeyekê yan herêmekê ji aliyê aborî û çandî ve. Ev şewe gerandin di dewletêni fireh û xwedî neteweyeke pirr mezin de ku îdarekirina wê ji navvendê pirr dijwar e, tê bikaranîn.

Di dema Împartoriya Osmaniye de ev cure gerandin ji bo gelên ji navvendê dûr, bi taybetî jî, ji bo Kurdan hebû. Di dema wergirtin û dagirkirina rojhilat de İngiliz û Fransizan ev şeweya gerandinê bi kar anîn, ji bo netewe û hindikahiyê bindestkirî û hinek herêm û navçeyan ji bo ku wan karibin bi navvendê ve girê bidin. Otonomî tu caran bi kîrî neteweke pirrehejmar, kevna-

re û nexasim ku iro şerê serxwebûnê dikin û bi sedhezaran ketine bin konê têkoşîna bi rûmet, nayê.

Di dîroka Kurdistanê de otonomiyê pirr tawanên (sûc) mezin bi xwe re anîne. Ev bû sedem ku Kurd hîn di sedsalên 15-18'an de di hişyarbûna neteweyî bi derengiyê bikevin û li dijî Sefewiyan alikariya Osmaniyan bikin, bi vî awayî jî Kurdistan parce bibe. Di dema damezirîna dewleta Tirk de dîsa fikra otonomiyê bû ku rî ber xebatêni ji bo Kurdistanê serbixwe girt û tevgera neteweyî parce kir. Di dema Peymana Sevrê de dîsa otonomî ji aliyê dewletêni serketî ve ji bo rîbirrîna hişyarbûna hestêni neteweyî hate bikaranîn. Dîsa di vî warî de Komara



Gelê Kurd bi otonomiyê nikare rizgar bibe.

Mehabadê nimûneyeke pirr xuya û diyar e.

Ev cure gerandin di dema şerê gelê bindest li dijî mîtingehkariyê de, di destê dagirkiran de bû çekeke zengarî. Dema ku gelên Asya û Afrîkayê ji bo serxwebûnê, li dijî dagirkirêni İngiliz û Fransizan şer dikirin ev gerandin wek alternatifike li dijî serxwebûnê û dewletavakirinê hat pêşîya wan. Wek tê dîtin xweserî tim bûye astengî û çeper li pêşîya pêşketina civakî û difetîn hestêni serxwebûnwxaz.

Wek ku em di mînakên jorê de ji dibînin, otonomî ne tiştekî baş e, lê gelo xeynî vê alternatifek hebû?

Çewtbûna wê tiştek e, lê divê bê zanîn ku heyâ niha li dijî wê alternatifike xurtune bû, ji ber vê yekê di meydânê de her tim otonomîxwaz diman. Vê alternatifî rihêni xwe di nava dil û mejiyê civaka me de berdane. Erê ew gerandin di gel hemû tawanên ku bi xwe re anîn, dixwaze xwe li dijî serxwebûnê wek alternatifekê bide pêş, xwe pê re bi-


pîve û listikan li ser bike.

Iro heke hinek mirov bi çavê otonomîxwaziyê li xwe binêrin û wan tiştên berê bikin, bila bizanibin ku iro di bin solêni neteweya me de wê biperçiqin û lane-ta dîrokî li wan bibarînin. Ev ne dîroka bîhûrî ye, tevgera bajarvaniyê, aqilmendiyê (intelligent) û zanyariyê ye.

Bîra ku goşte bêhnpêketî û nexwêş dibe para kera tûj û bêdilovan. Xwînrijandin bes e, otonomî nêzîkî gorê dibe.

XÂÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî



yên 11-Tîştê ku bi saya wî mirov tişta nas dike
12-Milk

BERSIVA XÂÇEPIRSA HEFTIYA ÇÜYÎ

Çeperast: 1-Toni Morrison 2-Êzidî/ AA/ Olî 3-Gorî/ Aw/ Adar 4-În/ Use/ Pine 5-Ka/ TSE 6-Etr 7-Çavtengî 8-Evîn/ Geh 9-Nt/ Îha 10-Maq
Serejêr: 1-Têgîn/ Çerm 2-Ozon/ Nav 3-Nîr/ Vînç 4-Îdî/ TNT 5-Mî 6-Astengî 7-Rawestgeh 8-Ra/ Eriha 9-Ap 10-Sodir 11-Olan 12-Nîre

KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiyê razînîn:

Li derive: Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Sub. Şube No: 1095
Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

Li Tirkîyê: Mazhar Günbat


İş Bankası Cağaloğlu Sub. Şube No: 1095
Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re cihêni li jor vala dagirin û tevî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bisînîn.

Navnîşana Welat: Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul Tel: 513 34 33 Fax (Tel): 511 50 07

Mercen abonetiyê:

Li hundir	Li derive
3 meh 120.000	50 DM
6 meh 240.000	100 DM
12 meh 480.000	200 DM



Kevok, qijik û torîk

Li quntara Çiyayê Reş
Raserî çem pêgihek xweş

Hebû şikeftek pirr kevin
Hemû pîrabok û tevin

Refek ji kevokên xal xal
Ew ji xwe re kirine mal

Li wê şikefta wek nawîs
Her êvar dikevine lîs

Zivistan çû, dem bû bihar
Şikeft li hev kirine par

Ji bo hêlinan çêbikin
Edî çeliyan derbixin

Lê li ser cih bi hev ketin
Berê xwe ji hev guhertin

Qijik zik ji wan dêşîne
Dibêje: "Ez reş, ew spî ne

Ew kevok in, ez qijik im
Çîma wek wan ne xweşik im"

Bi wan ket ji hev sar kirin
Hemûçik li hev har kirin

Refêñ kevokan bûn du bend
Qijik bc wan bû aqilmend

Kevok bimînin, bifirin
Bi qijikê dişêwirin

Edî her yek li ya xwe ye
Haya wan ji hev tune ye

Rojekê qijik çû berçem
Nêrî torîkek pirr bi xem

Xwe li ber çem gêr kiriye
Yek dibêje qey miriye

Qijika bêar û genî
Ban kiriye, pê re kenî

Got: "Tu rabe wek tayrê baz
Xwe wilô neke belengaz"

Torîk rabû bi giranî
Çavek vekir yê din danî

Got: "Bira tu min dibînî
Ev du roj in ku birçî me"

Qijikê got: "Ev kirê te
Xwarin nayê ber devê te

Tu şikefta han dibîne?
Wa tîjî lîs û hêlin e

Hemû kevokên xal xal in
Qelew, bedew û delal in

Edî tu bikeve dû wan
Bikuj û bixwe bêpîvan"

Torîk wê şevê dest pê kir
Çû û yek ji wan ser jêkir

Ji şikeftê derande der
Li bin latan pirtükand xwar

Karê torîk her şev ev e
Bi şev xwarin, bi roj xew e

Kevok roj bi roj kêm dibin
Lê nizanîn çawa bikin

Lew dijminê xwe nabînin
Her yekî xwe dihemînin

Dibêjin: "Ne ez bim hema
Kî bê kuştin ew ne xem e"

Gelekî xwe şemirandin
Çav miç kirin, damirandin

Dawî pênc-şesek ji wan man
Ew jî çûn û şikeft berdan

Meydan ma ji qijikê re
Ser cih danî pê re pê re

Lîs û hêlinen kevokan
Tev bi qijika genî man

Va ye bê çend sal qedîyan
Kevok qut bûn, ji xweş jiyan

Ew cih û war pêgîhê xweş
Ket bin destê qijika reş

Ew kevokên gelek sersar
Ketin rewseke derbeder

Li quł û qewarêñ çiyan
Digerin mîna sêwîyan

Heta ku ew bi serê xwe
Hilnegirin wî barê xwe

Ewê tim wiha ketî bin
Li gerdûnê tim sêwî bin.

Mîrê mêsan-2

Bixwe heta tu karî
Fedî neke tu carî"

Rabû destê mîr merast
Ji bo harê xatir xwest

Mîr geriya li derdor
Dîtin hinek mozê sor

Got: "Gelî mozan fekin!
Ku hûn bi ya min bikin

Taştê, şîv û firavîn
Tîm bi we dims, hingivîn

Lê daxwazeke min heye
Ew daxwaz pişa we ye

Ev çend roj in hinek mês
Hember min xwe didin pêş

Çend serkêşen wan bibin
Bikujin winda bikin

Fersendê bi wan nedin
Da ew serî hilnedin

Bila tim bi kéferat
Ji bo me bikin xebat"

Ma moz li ci digerin?
Dest bi wan mêsan kirin

Demê xafil, bêpêjin
Bi dizî wan dikujin

Lê mês bi wan hesiyan
Li hevûdu civiyan

Biryarek asê danîn
Gotin: "Bê kî ye xayîn"

Ger ku mîr be, paşa be
Ew tu car xelas nabe"

Wan bi doran her êvar
Dibijartin nobedar

Dîtin ku mîşa kulek
Ew bi mîr re büye yek

Mozên sor û mîrê wan
Bûne bela serê wan

Roja din mîşen karker
Bi serhildan, bi ceger

Şerekî hêl pêk anîn
Pêçik û dest hilanîn

Mîr û ew mîşen hevpar
Mîşa kulek dilgemar

Bi ser hevdu de radan
Şengilandin, girê dan

Tevan bi deng û qêrin
Got: "Ey mijok û xayîn!"

Hûn li ser me bûn zordar
Me dikir û we dixwar

Em ber wê jîna kevin
We ji me pirr dan kuştin

Edî demeke nû hat
Roja şahiyê hilat

Me pêk anî yekîti
Perçiqand ew mîritî

Wê keda xwe yagiran
Em nakin devê hovan

Bêxebat û bêtokoşîn
Kesek naxwe hingivîn"

Jîr Dilovan



Jîr Dilovan

‘Tevgerên Kurd zêde girîngî nedane zimên’

Em weşandina beşa sisyan a lêpirsîna li ser xwendin û nivîsandina bi Kurdi di vê hejmarê de ji didomînin. Rayedarên weşanxaneyen Zagros û Dozê pirsên me bi Tirkî bersivandin.

‘MESELEYA ZIMAN SIYASÎ YE’



Şefik Beyaz (Serokê Kargeriya Enstituya Kurdi)

“Ziman ji bo têkiliya di navbera mirovan de navgîneke, pergaleke herî girîng e. Ev ji ji ber hewcedariyekê, ji ber pêwestiyekê peyda dibe. Hewcedarî û pêwestiya zimanekî ji, li gorî têkiliyên rojane, li gorî têkiliyên bazarê kifş dibe. Heke zimanek ne zimanê perwerdeyî be û bi şêweyeke fermî (resmî) û bêyi fermî di avahîyen civakî û fermî de neyê bikaranîn, çiqas zimanekî dewlemed û xweser be ji, nikare bibe zimanê têkiliyên rojane û yê bazarê. Bi vî awayî ji, ziman nikare xwe pêş ve bibe.


Belê zimanê Kurdî zimanekî dewlemed û xweser e. Lê ji ber ku dijminên gelê Kurd li diji vî zimanî û li diji xwediyê vî zimanî politîka yekê bi hov ajotiyê, bi vî zimanî gelek tişt nehatiye nivîsandin, fersend û mecalâ gelê Kurd zêde çenebûye ku bi zimanê xwe pirtûkan, kovaran, rojnameyan û hwd bixwîne. Ji ber vê yekê ji di navbera gel û zimanê Kurdi yê nivîskî de an ku di navbera gel û kovar, rojname, pir-

tûk û hwd. de dûrîfî û sarîtiyek heye. Di vê sarîfî û dûrîtiyê de tesîra bişaftina dagîrkeriyê ji gelek zêde ye.

Heta gel negihîje azadiya xwe ya sîyasî, zimanê Kurdi ji bi timî nikare azad bibe. Heta ev ziman azad nebe û nebe zimanê perwerdiyê, nebe zimanê bazarê, an ku di têkiliyên rojane de nebe pêwestiyek û hewcedariyek, dê tîraja rojname, kovar û pirtûkên Kurdi zêde bilind nebe.

Lê di gel vê rastiyê, heke di jiyana civakî ya Tirkîyeyê da hin guherîn demokratîkî çêbibin û ronakbîrên Kurd ji, di nav gelê Kurd de ji bo danehezkirina Kurdi demdirêj û berfireh werin, hingî dê rewşa tîrajên rojname kovar û pirtûkên Kurdi bê guherin, di vê gavê de mirov dikare kampanyeke wiha bi fêmanî, di nav rewşenbîrên Kurd de weke: “Bi Kurdi binivíse” Di vê ev dirûşme (slogan), bibe perçeyekî jiyana rewşenbîrên Kurd.”

‘ÇEWTİYEKE SİSTEMİ ÇÊBÛ’




Nesimî Aday (Rayedarê Weşanxaneya Dozê)

“Şertîn siyasî ji bo pêşxistina zimanê Kurdi bûne asteng. Bi pirranî tevgerên Kurdi yêni siyasî, tu e-leqeyê nîşanî ziman nedan û ev mijar her tim di plana du yemîn de ma. Lê em dizanî ku yê li ser kultura xwe nikaribe saziyan damezirînin, nikarin jiyanekê serbixe we ji ava bikin.

Kurdan di hêla weşanê de ji gelek çewtî kirin. Mirov ji vê çewtîyê re dikare bibêje çewtîyekê sistemi; ji ber ku berî roman û berhemên e-debî, hewce bû alfabe, gramer, ferheng û pirtûkên basit bihatana çapkirin.

Em bi pirranî pirtûkên Kurdi diweşînin. Li gorî fikra me, hewce ye ku weşanxaneyen Kurdi, pirtûkên bi zimanê Kurdi biweşandana. Helbet astengen vê mijarê hene, lê ev pêwestiyek e. Li cem pirtûk, kovar, rojnameyan, hewce ye ku radyo, TV ango wasitayên ragihandinê bêhtir tesîrê çedikin.”

‘GEL BÊZIMAN NABE’



Mecit Kapazan (Sekreterê DEP'a Fatihê)

“Di bîr û baweriya min de pirraniya ronakbîrên Kurdan çawa wezifeya xwe ya siyasî neanîne cih, wisa ya xwe ya çand û zimên ji. Lewre hê di nav mala xwe de bi zarokên xwe re bi zimanê biyanî Tirkî, Erebî, Farisî diaxivin. Sedemê wê ji ew e ku bîr û baweriya wan a bi Kurdistaneke serbixwe qels e. Toz û dûmana tirsonkiyê li ser rûcikên wan kon vedaye.

Ji bo balkışandina bi ser xwendina bi Krudi pêwest e ku em çend ji wan xâlîn jérîn bi kar bînin:

1. Hîn bêhtir cih bidine pêkenok û çirokan
2. Rakirina tîrsê ji nava gel
3. Rûpelên zarokan, ji rûpelekî derxin du rûpelan

4. Bicîhkîrina sazûmanekî ku rojname li mal û cihîn din bê belavkirin

5. Girîng e ku di her hejmara Welat de şîrek û gaziyelek li ser livbaziyên gerîla bê nivîsandin

6. Peyvîn xwe hêsan bikin da ku gel tê bigihê

7. Wêneyan bi rengîn bikin.”

‘PÊWISTÎ BI PLATFORMEKÊ HEYE’



Ilyas Burak (Rayedarê Weşanxaneya Zagrosê)

“Sebebîn nexwendina weşanêni bi Kurdi bi rewşa politîka ya gel ve girêdahî ye. Zimên xwe bi politayê ve girê daye. Ta niha zimanekî siyasî di nav Kurdan de derneketiye meydanê. A din ji ew e ku di nav devokan de cihêrengî heye û xebateke ku wê ji navê hilde derneketiye rastê.

Ji bo bêhtîkirina hejmara xwendevanan; bi taybetî li ber çav e ku heta iro xebatêni bi serê xwe encameke erêni dernexistiye holê. Heta em dikarin bibêjin ku sebebek ji hev dûrbûna zimanê Kurdi ji ev cure xebat in. Lewma divê xebatêni bi vî awayî li platformeke fireh bêne kirin. Ev platform ji divê bi besdariya hemû kes û saziyên ku kîferata wan li ser zimên heye, pêk were. Heta pêwest e ku otorîteya wê li ser hemû dever û dorêni ku bi Kurdi weşanê dikin hebe.”

‘DIVÊ DERSÊN HÎNBÛNÊ HEBIN’


Süleyman Yaşar (Weşan-

xaneya Fırat)

“Zimanê Kurdi ji ber ku ne nivîskî ye, di nav gel de ji edetek xwendinê çenebûye. Sebebî kêm xwendinê ev e. Lê, niha tiştekî din ji heye. Weşanxane û rojnameyên Kurd, di weşanêni xwe de zimanekî giran bi kar tînin. Ev yek, çavê xwendevanan ditîrsîne. Hewce ye ku zimanê weşanê hêsan be. Nivîsên e-debî û yê zanyarî ji ber ku giran in, pirtûkên ku dertêni ji, bi pirranî bi vî zimanê têni nivîsandin û ev ji bala xwendevan nakişîne.

Lazim e di rojnameyân de dersên hînbûnê ji hebin. Her tiş hêdî hêdî çedîbe, zimanê Kurdi yê nivîskî ji, hêdibûneke wiha dixwaze.”

‘DIVÊ ZIMAN HÊSAN BIBE’



Ali Kara (Cigirê Serokê DEP'a Bağcilarê)

“Ronakbîrên Kurd bi dîti na min li serê vê mijarê di xebitin, lê divê ku em hê ji zehftirîn li ser bixebeitin. Lê tenê ev bar ne yê ronakbîran e, gerek e ronakbîr û gel tevde li ser ziman, xwendin û nivîsandinê rawestin. Ji bo vê ji qet nebe weşanêni Enstîtu û rojnameya Welat bêkemasî bêna taqîpkirin.

Ji ber ku weşanêni Kurdi niha gelek kêm in, yêne gerek e êdî zêde li ser çand, dirok, orf û adetêni gelê me bisekinin. Rojnameya Welat gerek e zimanê xwe hinekî din ji hêsan bike, wek min berê ji got giraniya xwe bide ser çand, wêje, dirok, tore û adetêni gel.”